

ARMANC
Ji mehê
carekê
dertê
Hejmar: 110
Çiriya Paşin
1990
Buha: 10 Skr.
3 DM

Armanc

SERXWEBÜN DEMOKRASI SOSYALİZM

ARMANC
Monthly
Kurdish
Magazine
No: 110
November
1990
Price: 10 Skr.
3 DM

Konferansa Ewlekari û Hevkari ya Ewrûpayê

Ma Kurd ne layiqî ewlekariyê ne?

● ● 34 dewlet ji bo ewlekari û hevkariya Ewrûpayê li Parisê civiyan Serokkamarên herdu blokên Ewrûpa ji bo çekdaxistin û leşkerkêmkirinê peymanek tarixî imze kirin. Rojavayê Tirkiyê dikeve ber vê peymanê, lê Kurdistana Tirkiyê li derveyî peymanê ma

● ● Hêzên Kurd li Parisê bi meşekê Serokkamarê Tirkiyê Turgut Ozal protesto kirin

● ● KEHE ji gelên Ewrûpi re këfkweşî, ewlekari û aramîyê dixwazin. Lê çima vê yekê ji bo gelên din yên cihanê û ji Kurdan re naxwazin? Ma bêyi Ewrûpiyan gelên din ne layiqî ewlekari û aramîyê ne?



Di navbera 19 û 21'ê Çiriya Paşin de li Parisê Konferansa Hevkari û Ewlekari ya Ewrûpayê (KEHE) çêbû. Di konferansê de serokkamarên 34 dewletin Ewrûpa besdar bûn. Pişti sê rojê civînê serokkamarên NATO û Pakta Varşovayê li ser çekdaxistin û leşkerkêmkirinê peymanek tarixî imze kirin. Li

gor vê peymanê herdu blok wê hecmek mezin çek daxînin û leşkeren xwe ji Ewrûpayê vekşinin. Pişti vê peymanê wê her blok di desten xwe de; 20 hezar tank, 30 hezar çekên zirxin ên herbê, 20 hezar silehên giran, 6800 teyarên herbê û 2 hezar jî helikopterên êrîşî bihelin. Tirkîye di çerçewa vê peymanê de wê 1490

çekên zirxin ên muharebê, 162 teyare û 40 helikopterên din bi dest xe û çekên ordiya xwe ji modern bike. Ji ber ku herêma Kurdistanê li derveyî vê peymanê ma bi hebûna van çekan xwedîgiravî Tirkîye wê "ewlekariya" xwe bi dest xîne.

Ji xwe çendekî berê Hukûmeta Tirkîye nameyeke taybetî ji Konseya Ewrûpa re şandibû û gotibû ku ji bo ewlekariya me mafê mirovî wê li Kurdistanê bê sekinandin. Lê ji xwe heta nuha tu carî li Kurdistanê mafê mirovî tunebuye ku dewleta kolonyalist a Tirk ji bo parastina dewleta xwe li herêmê mafê mirovî ji ortê radike.

Li aliyê din dewleta Tirk tu carî şerîn peymanen navnetewî yên ku bi xwe imze kiriye ji neaniye cî. Li gor peymana KEHE ku di vî warî de numûneyek berbiçav e

û dibêje ku "huviyet, kultur, ziman û dînê(olê) eqaliyetan wê bê parastin û mensûbên her eqaliyetê li ber qanûnan wek hev in û mafê wan heye ku huviyeta xwe ifade bikin, biparêzen û pêşde bibin."

Lê edî dinya alem ji zane li Tirkîye zimanê Kurdi qedexe ye yên ku derd û kulên xwe bi zimanê Kurdi ifade bikin têne girtin. Numuna dawî ji, Kongreya Komela Mafê Mirovî ya Tirkîye ye. Ji ber ku nûnerê Diyarbekirê Vedat Aydin bi Kurdi axaft, tevî tercûmanê xwe Awûqat Ahmet Zekî Okçuoğlu hat girtin û ew avetihe hefsê. Kultur û muzika Kurdi qedexe ye. Çendekî berê ji ber ku Bedri Ayselî di dawetekê de bi Kurdi stran got di

Heq nayê dayin,
tê stendin
Girtiyan
daxwazên xwe
dan qebûl
kirin

Girtiyan hefsa Diyarbekrê di 7'ê Çiriya Pêşin de ji bo ku surgûn-kirina 96 girtî û mahkûman bidin sekinandin dest bi grewa birçîbûnê û dûre ji bi ya mirinê kiribûn. Vê grewê piştî 38 roj liberxwedaneke bi qehremanî, di roja 4'ê Çiriya Paşin de neticeyek pozitîv girt, mesûlên hefsê bi berpirsiyaren girtiyan re rûniştin û li ser dawîdana grewê li hev kirin. Parlamente Salih Sumer, Serokê Baroya Diyarbekrê Awûqat Fethî Gümüş, Awûkat Sebahattin Acar, Awûkat Fewzî Vezendaroglu û çar kes ji ji malbaten girtiyan di vê rûniştin de besdar bûn. Li gor beyana ji bir û raya giştî re eşkere bû, idara hefsê hemû daxwazên girtiyan qebûl kirin û mafênu ku ji wan hetibûn stendin giş bi paş de dan.

Nuxteyên li ser hatin li hev kirin ev in:

1- Idara hefsê wê nûnerê hefsiyan nas bike.

2- Di bin navê faaliyetên sportîfi de heftê çar qawûş wê karibin hev û du ziyaret bikin.

3- Weşanên li derve bi serbesti têne firotin wê serbest têkevin hundurê hefsê ji.

4- Babetên xwarinê wê bêne zêde kirin û wê li mîktara kaloriyê ji bête diqet kirin.

5- Bedelê iâşê wê ji 2200 lireyi derkeve 4000 lireyi.

6- Ew kesên ku surgûn bûne û hîn mahkemên wan dom dikan, wê bi paş de bêne anîn.

7- Kaloriferên hefsê wê bi dûzan bêne vêxistin.

8- Ciyê cilşoyê wê ji nuh ve durust bibe û hewcedariya dermanê kinca wê ji alî idarê ve bête temîn kirin.

9- Tişten ku roja 7'ê Çiriya Pêşin ji girtiyan hatibûn girtin, wê bi paş de bêne dayin.

10- Polisê siyasî û Tîma Xusûsi wê tevî saxîkirinan nebin. Saxîkirin wê ji alî idara hefsê ve bêne kirin.

11- Li ber deriyê hefsê, serdanê hefsiyan wê ji alî polis ve nayê aciz kirin.

12- Di şeva surgûna 7'ê Çiriya Pêşin de ji ber lêxistinê raporê gelek kesî hene. Di heqê mesûlên vê hedîse de wê dawê bê vekirin.

13- Kesên ku ji bo hin pirşan diçin ba polis, gava vegeşîyan wê ji alî tiçtor vê bêne kontrol kirin.

14- Wê rê li ber danûstendina bi rêxistinê demokratî re neyê girtin.

Siya li ser bîryarê
Konferansa Parîsê

rûpel: 2

Rojeva Mehe

Siya li ser biryarên Konferansa Parîsê

Konferansa Ewlekarî û Hevkari ya Ewrûpa di 21'ê mehê de civina xwe xelas kir. Gava meriv guh bide beyanêni siyasi yên Ewrûpayîyan û şirovekirinê çapemînyen wan, dixuye ku qimîtek gelek bilind didin vê konferansê û biryarêni wê. Li gor wan, vê Konferansê di rewşa cihanê de qonaxeke nuh vekiriye. Bi vê yekê dawî li "Şerê sar" hatiye anîn, dûbesbûna Ewrûpa ji holi hatiye rakirin û di dîroka cihanê de cara pêşin e ku bi firehiyek wiha biryara çekdaxistin û leşker kêmkinê hatiye dayin.

Helbet KEHE di dîroka pêşveçûna cihanê de gavek giring e û gelek girêk û benden li pêşîya xwe-nûkirina civakan daye rakirin, di warê ewlekarî û aramîyê de bingehêk amade kiriye. Lî li alîyê din hin xal û xet di amadekirin û dawîlîanîna vê konferansê û biryarêni wê de hene, ku rê nadîn gel û welatên li derveyî cihana Ewrûpa û ya Amerika Bakur, bi qasî wan kêtfxweş û şâ bin, di vê cihanê de xwe bi qasî wan di ewleyi û aramîyê de his bikin.

Beri her tiştî, di naveroka vê Konferansê de ezeziyek (ezitiyek) Ewrûpayê xwe rû dide. Ew îhtîmama ku ji bo ewleyî, aramî û bextewerîya gelên Ewrûpa hatiye nişandan, ji bo gelên mayîn ên cihanê xwiya nakin. Xwiya ye gava Ewrûpî behsa cihanê dîkin, zedetir cihana Ewrûpa li ber çavêni wan e. Lî rastî ne wiha ye, Ewrûpa ne cihan e û ne ji sisîya yekê wê ye ji. Pirs û pirsgirekîn piraniya cihanê û bi taybeti yên belengaz, paşdemayî û bindesten wê, bi hemû giraniya xwe dom dîkin, jan û eşa rewşa iroyin bi hemû giraniya xwe ve li ser dilê wan e.

Ji alîyê din biryarêni Konferansê di warê mafêni miletan, hûrgelan û mafêni insanî de, di warê çekdaxistin û leşker kêmkinê de bi kîl û këmasî ne, ji temeni û niyetenî çak wêdetir tu tişli bi xwe re naynîn.

Di mesela tayinkirina qedera miletan da, Konferansa KEHE ya Parisê, bi gavekî ji li ya Helsinkiyê ne pêşdetir e, dijîfî tê de hene, biryara li hev nakin. Ji alîkî de behsa tayinkirina qedera miletan tê kirin, ji alî din de ji behsa, neguhertina hudûdên dewletan tê kirin. Di vê dinya me ya serdesti û bindestiyan de ger hudûdên dewletan neyîn guhertin, gelo milet wê çawa qedera xwe bi serbestî tayîn bikin û wê çawa azadî, ewlekarî, aştî û aramî li ser rûyê erdê berbelav bibe?

Di warê çekdaxistin û leşker kêmkinê de ji biryara KEHE gel û welatên Rojhîlat Navîn û bi taybeti Kurd li ber çav negirtine. Hemû welatên ku mora xwe li bin biryarêni vê Konferansê dixin, teahud dîkin ku çek daxînin. Sovyet qebûl dîke ku heta herêma Çiyayê Uralî têxe ber vê çekdaxistinê, lî ji bo Tirkîyê şerterki li gor vê nehatîye terzkirin. Tirkîyê çek û leşkeren xwe yên Kurdistanê li dervayê daxistin û kêmkinê dihêle. Rojavayê Tirkîyê wê têkeve ber vê peymanê, lî Rojhîlat li derveyî wê dimine.

Di rewsek wiha de ka gelo gelê Kurd çawa wê karibe kêt û şabûna xwe bi konferansek wiha bîne, ka wê çawa bawerîyek pê re çê bîbe ku di dînyak wiha de dost û yarêni wî ji hene. Helbet ne mumkün e.

Loma ji gelên cihana derveyî Ewrûpa, gelên bindest û paşdemayî û bi taybeti ji gelê Kurd, sed mixabin ku qasî nîvî. Ewrûpayîyan ji ewlekarî û aramîya xwe di biryarêni Konferansê de nabinin. Vê rastîya han ji siyek gelek tarî daxistiye ser Konferansê û biryarêni wê.

Parlamentera Partiya KESKAN ya ALMANYA Angelika Beer: "îstîxbarata Alman û Tirk di derheqê Kurd û Tirkan de ku li Almanya îltîca dikin û formasyonê didin hev"

Parlamentera Partiya KESKAN ya Federal Almanya Angelika Beer gelek caran çûye Kurdistanê û rewşa gelê Kurd di cî de dîtiye. Nûcengîhanê me yên Almanyayê B. Aştî di meha Tebabê de pê re hevpeyvînê çekir. Em beşek ji vê hevpeyvînê pêşkêşî xwendevanê xwe dikin

Armanc: Di warê navnetewi û di bîrûraya Ewrûpa de piştgiriya bi mesela gelê Kurd re tu çava dibin?

Angelika Beer: Di vî warî de li alîkî Konseya Ewrûpa, Parlementoya Ewrûpa, hukûmeten netewi û Konferansa Ewlekarî û Hevkariya Ewrûpa (KEHE) û li alî din jî raya gişî ya cihanê heye. Ez dixwazim vana ji hev biqetnim.

Berê di derheqê muesesên resmî de: Mafê insanî li Tirkîyê di rojeva hemû wan muesesan de ye. Sala çuyî Konseya Ewrûpayê di civînê de li ser Tirkîyê û problemen wê Ozal dawefî axaftinekî kir. Li ser mafê insanî hema hema seetek heq dan Ozal. Pirsên ku ji alî endamên Konseya Ewrûpa û ji alî min ve bi rengekî rexnegirî hatin pirsin bê bersiv man. Ji bo kesen bi rewşa Tirkîyê dizane ev derbak bû. Ya jî ew gaza ku ji alî rejima Saddam ve li hember Kurdên Iraqê hat bikaranî em bi bîr bînin. Sûretên getliama bi çekên kîmyayî hatibû kirin li hember cihanê hat nişandan. Raya gişî ya dînyayê ji ber vê wahşetî nefreta xwe nişanda. Zûjbîrkirina vê wahşetî divê iro em bipirsin ji bo çiye? iro kî Helepê bi bîr tîne?

Van mueseén navnetewi dîka-ribûn li hember Iraqê am-bargoya aborî deynin, agahdariyek navnetewi be-lav bikin, lê nekirin. Di komisyonâ berpirsiyar de Iraqê serokî kir û bi we-toya wê, biryara mahkûm-kirinê weto bû; wan ev yek xweş dîtin. Sebebê vê yekê ji vekiriye. Di çekdariya Iraqê de mesûlyetek dlewle-tên Rojava ên "demokratik" heye, ji ber vê yekê ji di veşartina miriyen de jî xwe berpirsiyar dibînin. Li ba dewletên emperyalist ên xwedîyên senayîyen modern ticareta çekan çiqas însan bikuje ji cardin mubah e. Meşandina vê siyaseta nemirovî di bin xêliya "siyaseta mafê insanî" de meriv gelekî dişine, lê rast e.


Bi taybeti Tirkîyê vê listikê bas dizane. Di serî de "kampanya li dij terorîzmê" kir meseleyek

navnetewi û di vî warî de piştgiriya "koma nîrxen demokratik" girt. Bi vê rehetiyê zulma xwe li ser gel zêde kir. Ji bo ku ji endamên NATO piştgiriya çekî û leşkeri bigre pozisyonâ xwe ya di warê stratejiya leşkeri de bi kartîne. Ev alîkî wê li hember Kurdan bê bi kar anîn lê kesen li ser hukûm qet alaqadar nake. Tirkîyê têkoşîna li dijî "terorîzmê" nuha jî heta qada narkosikê fireh kiriye. Di vî warî de tercûba me nîşan dide ku Îranê di bin navê narkosikê de gelek kesenî muxalefetên hukûmetê ya idam kiran, yan jî bi salan ceza kiran.

Munaqeşeya ku bila Tirkîyê bibe endamê Civata Ewrûpa ya na, perçeyek ji munâqşeyen xapandinê ye. Li ser ihlâlen mafên insanî li Tirkîyê hewqas xeber têku di esasê xwe de dibê endametiya Tirkîyê ne mumkûn be. Gava ihlâlen mafên insanî ciddî bigrin wê gavê wê munâqşea sekinandina alîkariya çekan u alîkariyê din bi hawakî bi berhem bê rojevê.

Nuxteyên jorîn nabe ku meriv bicânanâ wan ji kesen li ser hukum, ji dîplomat û dîwênen ekonomik re bîhêle, lê xistina perda ser ruyê vê siyasete ji bo piştgiriya navnetewi gelekî muhîm e. Ji bo rîxistinê Kurd û însiyatîfîn Kurdistanê hersal bîranîna wahşetî bi ya min dibê ne bes be. Wek numûne, ez nuha li Kurdistanâ Tirkîyê şikanîna sansûra li ser çapemeyî gelekî muhîm e. Ji bo rîxistinê Kurd û însiyatîfîn Kurdistanê Tirkîyê nehât bi cî anîn. Di dewsa wê de gotinê Tirkîyê tê qebûl kiran. Tê gotin ku ev, meseleyeke Tirkîyê ya hundir e. Taqîbata di derheqê firmayen ku mal sandine Iraqê ji bi zanîn serî lê gerandin. Heta iro ev firmana nehâtin cezakirin.

Numûna duduyan ji; Hukûmeta Federal çekan ixracî Tirkîyê dike. Di bin navê "alîkariya cekdariya xusûsî" de çek û tanken ku bi milyonan dîbin mal ji hukûmeta Tirkîyê re tê sandin. Di navbera herdu welatan de di gelek warî de hevkariye. Mesela hevkariya



Angelika Beer

megamên Alman bi MİT'e re. Muesesên îstîxbaratê di derheqê Kurd û Tirkan de ku li Almanya îltîca dikin û formasyonê didin hev. Bi vê siyasete ne bes ku li Tirkîyê ji ihlâlkirina mafên insanî re çav tê girtin, her wisa jê re alîkî ji dibe.

Armanc: Tu teşebûsên te yan ji yên partiya te "KESKAN" ji bo rakirina Qerarnama 413'an ya ji li ser bû-yarê din ên ku li Kurdistanê aktuel in, hene?

A. Beer: Nuha ji bo min a herî muhîm ev e; avakirina bîrûrayê ji bo rewşa Kurdistanê ya aktuel. Ev karekî zor e. Di siyaseta Alman de heyecana yekîtiyê wek dîwarekî lastikî ye. Tirkîyê, Kurd, kî alaqadar dike? Hukûmeta Federal bi hostayî zane balê ji ser mesuliyeta xwe bi dereke din de bikşîne. Pişti ku li Ewrûpa Rojhîlat tabloya dijmin xerab bû, Pakta Varşova belav bû, ji bo berdewamiya NATO yê li sebebêkî tê gerandin, di dijayetiya Bakur û Başur de tabloyeke nuh a dijminê eskerî tê çekirin. Li hember işxala Kuveytê ji alî Iraqê ve reaksiyona hukûmeta Federal reaksiyona diewleten Rojava yên din vê listikê eşkere derdixe ortê. Iraç tê mahkûmkirin, lê ew çekên di destê Iraç de nayê gotin ku ji destê me derketine, ev yek nayê rojevê.

Li Bonnê ew teşebûsên ku ji alî partiya KESKAN ve tê kirin tê nake. Gelek faaliyeten ku ji alî me ve tê kirin, mesela konferansên pressê yê pişti gerra me ya Tirkîyê, teşebûsên me yê taqîbkirina dawan,

Dûmahîk r. 11

Ji berpirsiyarê kovaran re cezayên hefsê

Biryara 12 sal û 6 meh ceza ji xwedî û berpirsiyarê kovara Medya Gunesi Cemal Ozçelik re û 6 sal û 3 meh ceza ji ji berpirsiyarê duymê yê kovarê Yaküp Karademir re, ji alî Yargitayê (mahkema bilind) ve di meha Çiriya Paşin 1990'ı de hat testiq kirin.

Hin 15 dawayê Yaküp Karademir dom dikan û di van dawan de ji zêdeyi 60 salan ceza jê re tê xwestin.

Wek tê zanîn, mahkema Stenbolê di 29'ê Çileya Paşin ya 1989'an de 12 sal û 6 meh ceza dabû C. Ozçelik û awûkatê wî muracatê Yargitayê kiribûn.

Kovara Medya Gunesi di Nîsana 1988'an de dest bi weşana xwe kir û di şertîn dijwar de bê tirs derdikeve. Heta nuha 14 hejmarê kovarê derketine.

Her weha xwediye rojnama "Vîranşehir"ê Eyyup Seyrek ji ji bo ku di hejmara 11/10/1989'an a rojnamê de hevpeyvîna Sekreterê Giştî yê Partiya Pêşeng a Karekerî Kurdistan (PPKK) Serhat Dicle çap kiribû, di 29/11/1990'an de 5 meh cezayê hefsê û 500 hezar ji ceze peran xwar.

NEYNIK

Mehmet
Uzun

Huwiyeta Neteweyî

Li ser pirsa huwyeta neteweyî peyivîn hem pir hêsan, hem pir zehmet e. Pir hêsan e, ji ber ku em hemû dizanî ku her netewe xwediye ziman, çand, tarix û welatekî xweser e. Ev meshûm ji bingehênu huwyeta neteweyî ye. Pir zehmet e, ji ber ku meriv nikare, bi çend gotinan yan ji bi çend "şerhî" sathî bersîva pirsên Em kî ne? Em ci ne? Em ji ku têr û ber ku derin ? bide.

Yek ji wan nivîkar û filizofen ku serê xwe bi pirsên weha û bi mesela huwyeta neteweyî diêşine, nivîkarê meksîkî Octavio Paz e. Herwekî ku tê zanîn, vî nivîkar û şâfrî giranbiha îsal xelata Nobelê ji wergirt. Ji ber ku bi hênceta xelata Nobelê, li ser Octavio Paz pir hatiye nivîsin, min dil tune ku ez li ser jiyan, berhem û şâriya wî binivîsim. Lî belê, gava meriv li ser huwyet û şexsiyeta neteweyekî dipeyive, bîvî nevî, heşî merivan diçe ser ger û lêgerîna Octavio Paz. Ji ber ku nivîkar û şâriya Octavio Paz li ser gera huwyeteke neteweyî û daxwaza şexsiyet, ziman, tarix û çandeke xweser ava bûye. Jiyana wî bi vê ger û lêgerîne pêçayî ye. Di her nivîsar, şîr û berhema wî de şopîn vê ger û lêgerîne hene. Ev şest sal in ku wî daye ser riya xwenasın, li xwe xwedî derketin û xwe nûkirinê.

Octavio Paz meksîkî ye, yanê mensûbê neteweyekî bindest û welatekî perçiqî ye. Bi hatina Spanyoliyan trajediya tarixa Meksîkayê dest pê kir. Eynî mîna tişîn ku bi serê Kurdan de hatine, Spanyoliyan bi serê Meksîkayê de anîn; bi darê zorê welatê Aztek û Inkan ku bav û kalên Octavio Paz bûn, vegirtin û ji ziman heta adet û üsilîn xwe, her tişîn xwe li ser serê xelkê Meksîkayê ferz kirin. Ziman gelê Meksîkayê wîndâ bû, medeniyeta wan a bedew û dewlemend ji hev ket, rûpelîn tarixa wan a kevnare hatin girtin û bi destê Spanyoliyan rûpelîn nû ku reş û kirêt bûn, hatin nivîsin, şexsiyet û huwyeta meksîkî bi dengê tifing û topê Spanyolî hate perçiqandin û merivê Meksîkî bû stûxwar, bêçare û bindest.

Ü bi dû keft û lefta sedsalan û tarixeke dirêj ji xwîn, xwîdan û hêşirê çavan re, iro ji, Meksîka û ziman, çand û huwyeta neteweyî ya meksîkî di bin nîrê cîranê xwe yê mezin Yekitiya Amerikayê de ye... Ma nivîkar û şâfrî vî welatê perçiqî û lawê vê tarixa trajik Octavio Paz nekeve pey hebûn û xweseriya welat, tarix û gelê xwe, gelo hingê kî dê bikeve pey? Ne bi tenê Octavio Paz, lê herweha Carlos Fountes û gelek nivîkar û ronakbîren Meksîkî ji bi eynî wezîfê rabûne û bi heyecan û daxwazeke bêwest û bêrawest ketine pey pirsîyaren mîna Em kî ne, Em ci ne, Em ji ku têr û ber bi ku derin?..

* * *

Yek ji wesif û xusûsiyeten herfi mezin ên ronakbîran ew e ku ew bi kar û berhemên xwe bibin dengê mîjî û dilê welatê xwe, ziman hîs û bîrên gelê xwe, çavê hal û hewalê tarixa xwe û niwênerê yekemîn û metîn û huwyeta neteweyî xwe. Gava ronakbîr dikare bi vê rolê rabe û van karan bi cih bîne, hingê ew ronakbîr e. Ferqêke mezin di navbera ronakbîr û berdevkîn xwenda de heye. Ronakbîr dipirse, diafirîne, li tarixa xwe xwedi derdikeve, feyde û dahatûya welat û neteweyî xwe di ser her tişî re digire, xwe perçeyekî tevgera gerdûnî ya merivahiyê dibîne. Herçî berdevkî e, ew neafirîne, lê vediguhezîne, napirse, lê diparêze û dixwaze tarix, çand û huwyeta neteweyî xwe têxe nav kirasê teng û xwediye bir û baweriyê ku berdevkî jê re berdevkî dike. Octavio Paz ji bo xwe û welatê xwe dibêje ku "aqilmendîn navdar her tişî û herweha ferqiyet û newekheviya me û Amerika Başûr, bi tenê, bi termîn ekonomik izeh dikan û dibêjin; ew dewlemend û pêşkefi, hûn neçar û paşkefi ne... sebebê her tişî ji ev e, ferqiyet ji ji vir tê... na, ev yeka ne rast e, eger ev bîr rast be, hingê rol û giringiya tarix, adet, tore û huwyeta neteweyî li kû dimîne?"

Tarix, adet, tore û huwyeta neteweyî hem ji bo do û fro, hem ji bo pêşerojê pêwist e. Ferqêkî ekonomik li her aliyan dinê hene û encamên ferqêkî ekonomik ji, bêguman, pir in. Lî ronakbîrekî ku ketiye pey pirsîyaren li dora huwyet û şexsiyeta neteweyî, nikare rû ji tarix, adet, tore, ziman û çanda welatê xwe bade. Ji ber ku tarix reh û rîç e; adet û tore bîr û hîzr e; ziman û çand mîjî û ruh e. Gava welatekî yan neteweyekî yan merivekî xwediye tarix, adet, tore, ziman û çandeke xurt be, hingê tevgera wî ji xurt e. Ew bi xurti pê li axê dike, bi xurti dimeşe, bi xurti difikire, bi xurti diafirîne. Ew bi xwe bawer e, zû tiştan ji hev derdixîne, pihet bi stuyê neheqiyân digire, bi leza birûskê bîr bi tiştan dibe, ji xwe fedî nake, dikare yekitiya xwe ava bike, nabe berdevkî kesî û hebûn û xwesirîya xwe her tim diparêze.

* * *

Gelo rewşa me kurdan, di vî warî de çawan e? Gelo ronakbîren kurd di warê huwyet û şexsiyeta neteweyî de ci dikan û li kîjan qonaxî ne?.. Berî niha bi çendekî, ez bi balafirê diçûm Parisê. Min çend kitêb ji, ji bo rîwîtiyê, bi xwe re dibirin. Yek ji wan kitêban a Şahînê Bekirê Sorekli Mehmekemirina Selahiddinê Eyûbi bû. Gava balafir bi firê ket, min bîrayeke sar danî ber xwe û kitêba dostê xwe vekir û dest bi xwendinê kir. Kitaba büyük şanoyeke [piyeseke] büyük ku li ser hukimdarê İslâmî Selahiddinê

Eyûbî bû. Sela-haddînê Eyûbî kurd bû, lê li kurdîya xwe xwedî derneketibû û bûbû şervanî din û ola İslâmî û li hember xâçperestê Awrûpayê ola İslâmî parastibû. Ew hukim-darekî jî, têkoşerekî yeman û İslâmî bû. Wi ola İslâmî parastibû, lê welatê xwe Kurdish-tanê û gelê xwe yê Kurd ji bir kiribû. Ola İslâmî bi ser ketibû, lê welat û gelê wî ji hev ketibûn. S.B. Sorekli ji di piyesâ xwe de Selahiddinê Eyûbî ji dewrê kevn wergirtibû û anîbû roja me, 1993, da ku wî mehkeme bike û jê bipirse, "Selahiddinê Eyûbî, we ji bo ci sûda gelê kurd nehanî ber çavan?"

Piyesâ bi zimanî xweşik kêmâniya hîs û bîrên huwyeta neteweyî diyarı xwen-devan dikir... İcar sernavê kitêbê bala rîwiye ku li kèleka min rûniştibû, kişand. Ew ji porres bû û ji Stockholmê diçû Parisê. Em hinekî, bi zimanê Swêdi, bi hev re, li ser Selahiddinê Eyûbî peyivîn. Haya wî ji meselan hebû û ew merivekî serwext bû. Bi dû xeberdana bîskekî re, min jê pirsî ka ew ji kîjan welati bû. Wî pêşî got Iran, paşê ji got Urmiye. Min jê pirsî û got, "ma Urmiye ne bajareki Kurdan e?" Wî got, "belê, ez Kurd im ji." Ew "ji" ya ku wî anî dawiya cimla xwe, ez êşandim. Herçend min bi bersîva wî dizanibû, min dîsan jê pirsî, "cîma ji?" Bersîva wî mîna min dipa bû; ew merivekî enternas-yonal bû, mesela çînayetiye ji mesela neteweyî gîringtir bû... Ev rewşa ku ne xerîbî min bû, agir bi dilê min xist. Rewş ne xerîbî min bû, ji ber ku min ji bi qîre qîra xwe ya li ser "sosyalizm û enternasyonalizm" nefes li gelek kesan çikandibû. Bi dû re, pişti ku ez rasî ziman, çand, edebiyat û neteweyen din hatibûm, ez li xwe û ziman, çand, edebiyat û huwyeta xwe ya neteweyî vegeriyabûm. Niha ji zilamê kurd û Iranê di eynî rewşa kambax de bû... Em her sê, ez, zilamê Kurdê Iranê û Selahiddinê Eyûbî, li ser esmanan, dibûn şîrîkî tiştekî ne xweş; kêmâna zanîna huwyeteke neteweyî. Ev rastiya me bû. Rastiyeke tahl ku me ji sedsalan û vir ve jê kişandibû. Zanîna huwyeteke neteweyî li ba me kêm bû. Kesîn ku haya wan ji vê zanînê hebû, li ba me kêm bûn. Kesîn ku bi doza huwyeteke neteweyî rabûbûn, li ba me kêm bûn. Bir û bawerî û ideolojiyê ku zanîn û şîura huwyet û şexsiyeteke neteweyî ji me bi dûr dixistin, em dil girtibûn, em bûbûn berdevkîn xelkê, -beyî ku haya me jê hebe;

- Eger emê bibin Misilman yan komunist, em divê bibin Misilman yan komunisten welat û neteweyê xwe.

Loma pirsîyaren ku Octavio Paz li pey in, Em kî ne, ci ne, ji ku hatine û ber bi ku derine, pirsîyaren bingehîn in û bala merivan divê her tim li ser be.

Bi alîkariya derive Iraq çêkirina gazên jahrê didomîne

Netewê Yekbûyî heta jê tê bila li diji Iraqê bîryaran bigre û boykota navnetewî deyne ser, lê heta ku dolarê Saddam hebin, wî di praktikê de tu tesiran nîşan nedin.

Çimkî ji burjuwazî û ji xwediye monopolan re dolar ji exlaq, ji moral û ji normen navnetewî geleki muhimtir e.

Ew fabrikên Iraqê ku bi alîkariya şirketîn derva hatibûn çêkirin teví boykota navnetewî hîn ji bi rengeki normal dixebeitin û her roj

bi sed kîloyan jehrê çedîkin. Kovara hefteyî ya Alman Der Spigel di hejmara xwe ya 26.11.90'ı de vê informasyonê dide û bi berdevam dibêje; di nav sektora leskeri de ji çêkirina gazen jahrê, bêkembûn her berdevam e.

Kovar van agahdariyên xwe dispêre informasyonê hin kesen istixbaratê û dibêje, bes li herêma Samara tenê rojê bi kêmâsi 400 kîlo gazen sinir tên çêkirin.

Rewşa Zarokê Cîhanê

Iro li dinê heroj 40.000 zarok dimirin. Herçiqas tê gotin ku zarok hêviya rojê dehatû ne ji lê tu tedbir li hember mirina zarokan nayê stendin. Tedbirên ku tên stendin ji têr nakin.

Ewrûpi, dema cinsek ji heywanan dikeve talûka jîholerabûnê tofanê radikin û tu dibînî ji nişka ve hemû masmediya dinê dest bi gotübêja parastin û spartina vî haywanî dîkin. Dema mas-madiya bi hevre dest bi propagandayê dîkin hemû dinya jê agahdar dibe. Bi milyaran pere tên topkirin da ku ev cînsê heywanê ku di talûka windabûnê de ne bêtir parastine. Lî belê dema babet insan bi xwe be tofan ranabe û Ewrûpi "humanistiya" xwe ji bîr dîkin.

Li gor istatistikâ ku rojnama Times çêkiriye encamên li jêr derketiye holê;

u Di rojekê de ji 40.000'i zêdetir zarokên di bin 5 salî de dimrin û ku mirov bixwaze dikare sebebên mirinê ji holê rake.

u Nêzî 150 milyon zarokên di bin 5 salî de ne ji xawrin û waxarinek baş dûr in û nêzî 23

milyon zarok di birçibûnê de ne. u Zêdeyi 100 milyon zarokên ku di emrê dibistanê de ne piyê xwe navêtine dibistanê. u Zêdeyi 30 milyon zarok li kolanan dijin.

u Nêzî 7 milyon zarokên penaber ên ji welatên ku di şer an ji di xelayê de ne, hene.

u Li navça Afrikayê û li Rojhilatâ Afrikayê heya sala 2000'ı wê 10 milyon zarok ji dê û bavê xwe yekî ji her sedema nexweşîya AIDSê wîndâ bû.

Ji 14 milyon zarokên ku di salekê de dimrin 2/3 ji ber nexweşînen wek sorik, e'mel, felc, xwarin û ava qirêj an ji ji infeksiyona navikê ye. Ji van nexweşîyan emelbûn û ji ber wê mirin zêdetir e. Li gor raporan doktoran ku mirov paketêk ji xwê, şekir û kalyum pêkhatî tevli avê bike û bide zarokan, wê ji mirinê xelas bibin. Mesrefa paketek wiha ji 57 qirşê Swêdi ye. Ji bo nexweşîyen din ji penesilîn dermanekî esasi ye û mesrefa wê ji ne pir e.

Li gor istatistikâ Times tenê li Hindistanê 100 milyon zarokên di bin 15 salî de kar dîkin. ●

RAMANÊN RAMANWERAN

Perspektîfa Kurd û Kurdistanî

Li dinê guhertinek ber bi çav dibe. Guhertin helbet ne tenê bi şiklî ye, lê bi naveroker jî. Guhertina ku dibe pîralî ye, him siyasiye him jî civakî ye. Divê mirov teslim bike ku ev guhertina pîralî û erînî bi saya bîr û baweriya perestroyka û glasnostê dest pê kir û iro ji wek ava lehiyê bi lez û bez li her aliye dinê xwe nîşan dide.

Em Kurd jî ketin ber vê lehiyê û me jî bi awakî dilgermî baweriya xwe bi perestroyka û glasnostê re beyan kir. İnsanen me dest bi jiholêrakirina dijitiyên xwe yên şexsî û siyasiye kîrin. Ev jî helbet gelek baş e û divê bê domandin. iro mirov dikare bi tundî bêje ku baweriya me ji bo yekîtiya Kurdan ji her demê xurttir e û xuya ye ku yekîtiya Kurdan ne xeyalek e. Tenê ji vê yekê re dilxwaziyeq paqîj divê. iro ne roja bi pêşxistina kariyeren şexsî yan jî zaafiyetîn grûbî ye. Roj roja bêhnfirehbûn, piştigîrî û fedekariyê ye.

Helbet mirov nikare bêje ku em miletékî homojen in. Di nav me de cur be cur insan, grûbîn siyasi û partiyen bi bîr û baweriya xwe cuda cuda heine. Lê rewşa me ya iro û do ne wek hev e. Do gelek tişt hebüñ ku dibûn sedemê dijtiya kes, grûbî û partîyan. Lê iro rewş ne wisa ye. Ew dijitiyên ku em ji hev dûr dixistin, iro tune ne. Berevajîya vê, ji bo nêzbûn û yekîtiya hêzîn Kurdan gelek tişten müşterek peyda bûne.

Ez di vê nivisa xwe de dixwazim bahsa babetekeku yek ji tişten müşterek ê herî girînge bikim. Ev babeta ji "Kurdbûn" e. Bi baweriya min ev babeta han ji bo hemû kesen ku jiyana xwe ji bo rizgarîna gelê Kurd feda kirine û herkesê ku li gor qewet û îmkana xwe di têkoşîna gelê Kurd de ciyê xwe digre derbas dibe.

Weke ku wê bê bîra xwendevanan jî, dema me belavokek an ji gotarek dînîvisand- ev yek ji bo hin kes, grûbî û partîyan hê jî derbas dibe- me ji rewşa dinê dest pê dikir. Pesindayîna sistêma sosyalist, qirêtkirina sistêma kapitalist û sê hêzîn şoreşger beşek mezin ji naveroker belavok an ji gotarê bûn. Piştire dor dihat Rojhilata Navîn û pey de Tirkîye û dema dor dihate Kurd û Kurdistanê di gotar û belavokê me de cî

Dema ku perspektîfa mirov "Kurd û Kurdistanî" be li hember yekîti, cephe û hevkariyê tu bend namîne. Bîfa partiyen bi bîr û baweriyên cur be cur hebin û wê hebin jî. Lê berê her ci dibe bila bibe, divê perspektîfa wan Kurd û Kurdistanî be. Wê demê-sosyalist be, İslâmî be yan jî xwedî bîr û baweriyeq din be- hevkari û pêkanîna eniyan wê hêsanter be û hevkari û enî bi jiyana xwe wê dirêtir bibin

nedima. Xweş tê bîra min ku dem hebüñ ku me digot "bila pirsa gelê Kurd qurbana tevgera dinê be. Mesela şoreşa dinê berê şoreşa me tê û hwd." Şexsiyeta me ya siyasiye ji Kurdbûn û Kurdistanî pêk nehatibû û ji ber vê yekê jî me gelek caran xwe ji bo mesleheta kesen din an ji miletê din feda dikir. Helbet sedema vî tişti hebüñ. Carekê em siyasete ji devê "sosyalist" û "komünîstîn" gelê serdest hîn dibûn. Parastina Sôistema sosyalist û lêkolîna pirs û pirsgirêkên sosyalizm û komünîzm mecal ji me re nehitibû ku em li ser mesela xwe bi awakî rîk û pêk rawestin. Parastina Sovyet bûbû parastina komünîzm û di vê rî de em gelek şehîd jî dan. Pirsa Kurd û Kurdistanê ketibû deraca sêyemîn yan ji çaremîn. Sedema dijminatiya hêz û grûbîn Kurdistan ne Kurd û Kurdistan lê bûyer û objektîn dereke bûn.

Pir mixabin ku meylêni wisa carek din bikevin rewşa berê û hebûna xwe ya objektif ji bîr bikin. Bi baweriya min munaqeşa "Stalinîzmî", "Lenînmî" û "Marksîzmî" dibê ji bo me Kurdan nebe babeta herî girîng. Munaqeşeyen wisa pirsa gelê Kurd di reca duemîn de dihelin û şâşitiya ku me berê kiribû her ji xwe ev bû. Ji min re wisa tê, ku em Kurd dixwazin "pêşengîya" bi şâftina pirsên navnetewi bikin. Munaqeşa sosyalizm bîla bêtin kolandin. Lê bila ew nekin bendek li hember hêz, kes, grûbî û partiyen Kurdistan. Di eslî xwe de munaqeşeyen wisa ji kesen siyasi re ji munaqeşeyen pirs û pirsgirêkên Kurd û Kurdistanî hêsan-tir tê. Malzeme ji bo vê yekê pir in. Lê karê esa-sî û munaqeşa esa-sî peydakirina malzemeyen li ser pirs û pirsegirêkên Kurd û Kurdistanê ye, ne tiştekî din.

Dema ku perspektîfa mirov "Kurd û Kurdis-

Hesen Mizgîn

berê ji gotibû meylêni ku dixwazin ya xwe li ser federasyonê bidin ferz kîrin hene.

Dema perspektîfa mirov "Kurd û Kurdistanî" be gotübêja "em û ewan" namîne. Di vê babetê de gotara Mehmed Uzun gelek di cî de ye (Binêre Armanç hej. 107-108 koşa Neynikê) û ne hewce ye ku meriv ser de zêde bike. iro ji bo me Kurdan bi taybeti li derveyî welêt gotina "Em" a bi hêz pêwîst e. Perçebûn "Em" û "Ewan" me Kurdan li ber çavê bîr û raya giştî piçük dixîne û baweriyeq tund peyda nake. Do, li her derê dinê, hêzîn ku li dij hevdû û herçiqas dijitiyên wan ên meslehêtê ji hene û problem dernakeve. İcar em ne dijmînê hevdû ne, ji miletékî û ji welatekî ne, ma cîma emê nikaribin "Em' ek bi hêz û bi yekdengî biafirin?

Dema perspektîfa me "Kurd û Kurdistanî" be mesleheta gelê me li hember gelên din nakeve dereca duemîn. Meslehêtê rojane herçî şexsî û grûbî be ji li holê namînin. Di rewşekî wisa de serokîn me nikarin di civînên navne-tewî de tenê behsa grûba xwe bikin û gelê xwe ji bîr bikin. Bi ya min kes, grûbî û partiyen ku di firseten wek civînên navnetewi de li pey meslehêtê xwe bin û wan bidin pêş, ji Kurdbûn û dûr dikevin. Ew kes, grûbî û partiyen ku li pey meslehêtê rojane ne nabin malê miletê xwe û roj bi roj wê ji miletê xwe dûr bikevin.

Di perspektîfa "Kurd û Kurdistanî" de Federasyona Komelên Kurdistanê li Swêdê nimûneyek pirr baş e. Kesen ku di kar û barên Federasyonê de cih girtine-herçiqas şexsiyekî wan a siyasi hebe ji tu caran bi meyla xwe ya siyasi hereket nakin. Tu kes li ser navê siyastekî nikare xwe bide pêş û dema ku diqewime ji bi raya giştî tê mahkûm kîrin. Lê belê pirr mixabin, wek min

Bîranîn

Lewent Firat

Bîranîn şaxsiyeten mezin dibin rûpelê zêrîn yê dîroka wan. Bi bîranan meriv pirr tiştan fêr dibe. Mesela ez bi pirtûka rojnamevana Tirk Sebiha Sertel a bi navê "Roman Gibi" (Wek Romanê) (ku pirtûk ji bîranîn wê pêk tê) fêr bûm ku di destpêka qîmî 20'an de, hejmarek mezin Kurd li Amerikayê jiyane û bi navê "Hîlalî Ahmer" komelek wan hebûye. Dîsa ji pirtûka nivîskarê Bûlgar Stoyan Zaîmov "Mînaloto" (Dema Bihûrî) ku ev pirtûk ji bîranîn wî ne; fêr bûm ku qehremanê Millî yê Bûlgar yê herî mezin Vasîl Levskî ku li dij Osmaniyan organîzasyonê serîhildanê ava kîriye, lê wexta ew tê girtin ji bo tehqîqata wî yekî Kurd bi navê Kurd Hafîz di 5. XI. 1872'an de tê tayîn kîrin. Kurd Hafîz cezayê idamê dide wî û ew tê idam kîrin.

Lê ci heyf e ku şexsiyeten me yên Kurd ku di civat û dîroka me de rolek mezin lîstine, negîstine wê yekê ku bîranîn xwe binivîsin. Ku em Beytar Nûrî Dersîmî, Kadri Cemîlpaşa û Ekrem Cemîlpaşa derxin, derveyî wan, kesi bîranîn xwe nenivîsandine. Çend kes ji bi saya hin rojnamê û kovarên Kurdan wek hevpeyîn bîranîn xwe pêşkêsi xwendevana kirine û dikin. Ji van İbrahîm Ahmed û Hejar Mukriyanî di Kurdistan Press de derket û derdikeve. Û yê din ji Ehmedê Abdurehman Axayê kurê Şâhîn Axa yê ku piştî mirina wî Armanç bîranîn wî bi dest xist û çap kir. Kerîm Husamî ji bi Soranî bîranîn xwe li Swêdê çap kir.

Kitêba Mûsa Anter a bi navê "Bîranîn min" çendekî berê li Stenbolê di nav weşanen "Doz" de derket. Mûsa Anter bi bîranîn xwe valayıyek tije kir û gelek tişt ronî kir. Mesela bahsa keça Emin Ali Bedirxan; Meziyet Ali Bedirxan(Çınar) Xanîmî dike (ku bi pêşniyara Ataturk paşnavê wan büye Çınar) û bahsa xanîma Osman Paşa (kurê Bedirxan Paşa) Nesrin Bedirxan(Çınar) Xanîmî dike. Herçiqas ev malbat nêzî dused salen dawiyê di dîroka Kurdistanê de rolek sereke lîstine ji em di derheqê wan de tiştekî zêde nîzanin. Li gel vê, tê gotin 27 lawen Bedirxan Paşa hebûne.

Dîsa em bi saya wî fêr dibin ku şehidî mezin yê Kurd Dr. Qasimlo li Stenbolê dest bi xwendinê Kîriye û bi alîkariya Mûsa Enter û Kamûran Bedirxan çûye Awrûpayê.

Ne tenê ev. Sebeba girtina "49'an", têkiliyên di navbeyna wan û berxwedanen wan yê hefsê de, li ser pêşniyara Amerika (ku di derheqê Kurdan de ye) dijitiya navbera Salt Kirmîzîtoprak (Dr. Şîvan) û nivîskarê kitêbê, dijitiya navbera Hesen Deger û Tarık Ziya Ekinci de, di hefsan de "dostaniya" Salt Elçi û Ziya Şerefhanoglu û gelek tişten enteresant ên din ku meriv bi heyecan dixwîne.

Ji xwe di qapaxa dawîya pirtûka xwe de Mûsa Enter dibêje ku "Ez şahidî sündxwari û jîndarê 55 salen dîroka Tirkîye me. Ma tenê şahid? Her wisa sanîxê, mahkûmî û dawaciye wê me ji." Rastî ji di van 55 salan de Mûsa Anter pirr tiştan ronî dike. A herî baş, yênu ku bi siyasete, bi edebiyatê, bi rojnamevaniyê û bi dîroka Kurd re mijûl dibin, lazim e vê kitêbê bixwînin. Yênu ku bi van tiştan mijûl nabin ji dîsa lazim e kitêbê bixwînin, wê perçakî ji dîroka xwe fêr bibin.

Lazim e gotina dîrokvanê Ingiliz Arnold Tounbee hergav di bîra me de be, ku dibêje "Ji bo miletékî felaketa herî mezin ew e ku dîroka wî ji alî dijiminî wî ve bê nîvîsandin".

Kwezî Dr. Naci Kutlay, Kemal Burkay, Celal Talabani, Dr. Mahmut Osman, Samî Abdurrehman û şexsiyeten Kurd yê din ku di dîroka Kurdi de rolek lîstine bîranîn xwe binivîsandana.

Lêkolîn

Di Kurdî de Tewandina Navan

M. Elî

Amed Tigris di Jimara 65'an a Berbangê de(r.25) behsa wê yekê kiriye ku hin navên rêxistin û weşanên Kurdan çewt têr nivîsandin û hin nimûne dane. Tiştê ku wî nivîsandiye gelek rast e, lê ew li ser wê yekê nesekiniye ku çîma divê bi wî awayî bêr nivîsandin. Her wiha divê bê diyarkirin ku çewtiya ku Amed Tigris li ser rawestiyaye, ne bes di bikaranina navên hin rêxistin û weşanen de ye. Ev mesele di rêzimana Kurdî de girêdayîye bi tewandina navan(çi navên taybeti bin ci ji yên cinsî bin)

Bi vê wesîlê dixwazim di vê nivîsarê de li ser mesela tewandina navan rawestim. Her wekî tê zanîn ku zimanê Kurdî zimanekî tewangbar e. Di Kurdî de du halênavan hene: halê xweber (yalin) û halê tewandî(bükümlü).

Di zimanê me yê nivîskî de li ser mesela wê yekê ku nav li ku di kijan halan de divê bêr tewandin(bi standardizebûna zimanê nivîskî û û bin tesîra zimanê devkî de) tevlihevî û bêserüberiyek heye. Di peyvîn xwe de li gelek herêman em navên mî ditewinin lê dixwiyê ku me dev ji tewandina navên nîr berdaye. Her wekî di peyva mî ya "av"ê de em dibêjin "dengê avê" lê di peyva nîr ya "nan"î de em nabêjin "tama nanî" yan "tama nîn" lê em dibêjin "tama nan". Eşkere ye ku bikaranina nimûna dawîn ji ali qâidîn rêzimanê ve çewt e.

Hin nimûne li ser şasbikaranina tewandina navan:

şas	rast
Gaziya Welat	Gaziya Welât yan jî Gaziya Welâfî
pariyê nan	pariyê nîn yan jî pariyê nanî
serê zinar	serê zinêr
çiyayê Qerecdax	Çiyayê Qerecdaxê
Şoreşa Kurdistan	Şoreşa Kurdistanê
meleyê gund	meleyê gundi

Berî ku em li ser wê yekê bisekinin ku ka nav kengî û çawa têr tewandin, ji bo hêsanîyekî bîne ser behsa me, ez dixwazim çend tiştan nişan bikim li ser zamîrên şexsan ên di zimanê Kurdî de. Wek ku tê zanîn zimanzan diyar dikin ku du grûb zamîrên şexsi di Kurdî de hene.

Ev:

grûb I	grûb II
ez	min
tu	te
ew	wîwê
em	me
hûn	we
ew	wan

Zamîr ew peyv in ku şuna navan dignin. Loma bi baweriya min ji dêvla ku em zamîrên şexsi dikin du grûb, rasttir e ku wek yê navan em behsa du halê zamîrên şexsi bikin: halê xweber û halê tewandî. Zamîra ku dikeve şuna halê xweber yê navan jê re bê gotin "halê xweber yê zamîra şexsi" û ya ku dikeve şuna halê tewandî yê navan jê re bê gotin: "halê tewandî yê zamîra şexsi." Li gor vê; "ez" dibe halê xweber yê şaxsê yekemîn ê yekejimar û "min"

dibe halê tewandî yê zamîra şexsê yekemîn ê yekejimar. Di zimanê Kurdî de mesela bikaranîna halê xweber û yê tewandî yê zamîran hema hema bi tevayî rast tê bikaranîn lê gava navek di şuna wan de tê bikaranîn gelek caran navên nîr şas tê bikaranîn nayê tewandin.(Divê em li vir diyarbikin ku ev şasî bes ji bo hinek herêmân zaravê Kurmancî ye. Di zarava Dimili de û gelek herêmân zaravê Kurmancî- her wekî Bahdînan Botan û Şikakan- her du awa rast tê bikaranîn) Loma gava di mesela bikaranîna halekî nav de em têkevin şikê, çêtir e ku em bifikirin ka gelo ji devla nav me zamîr bikarbanîna me yê kijan hal bikarbanîna. Wê gavê em ê bikarbin ku halê rast ê "nav"î bikar bînin. Lê ev rê ji ji sedî sed encamek rast nade çimkî hin caran tê dîtin ku li hin herêman zamîr ji rast nayê bikaranîn.

Her wekî:	şasbikaranîn
Te ez kuştîm	Te min kuştî
Te ez xwarim	Te min xwar
Min tu kuştî	Min te kuştî

Piştî vê şirevekirinê niha bi alikariya zamîran em hin mîsalan li ser bikaranîna tewandina navan bînin

cumla zamîrê	cumla navî
Ew tê	Azadî tê.
Ew hat.	Azad hat.
Ew dixwîne.	Azad dixwîne.
Wî xwend.	Azadî xwend.
Ew wî dukuje.	Azad Xezalê dukuje.
Wî ew kuştî.	Azadî Xezal kuştî.
Ew li wî dixe.	Azad li Xezalê dixe.
Wî li wî xist.	Azadî li Xezalê xist.
Ew ji wî mîrtir e.	Azad ji Osmîn mîrtir e.
Ew di wê de ye.	Çirok di pirtûkê de ye.
Mala min piçûk e.	Mala Zinêr piçûk e.
Ji te pê ve kes nayê.	Ji Kemîl/Kemalî pê ve kes nayê.
Dewr dewra wî ye.	Dewr dewra Özêl e.

Piştî van nimûnan em werin ser wê yekê ku nav li ku û di kijan halan de têr tewandin.

a) Di binavkirina(tamlama) navan de navê ku bi nav dike(tamlayan) her gav tewandî ye

Roja Welêt	yan jî Roja Welâtî
kurê jînikê	-
dewra Özêl	yan jî dewra Özâlî
goşte mirîşkê	-
goşte dîkî	-
pariyê nîn	yan jî pariyê nanî
kuça bajêr	yan jî kuça bajarî

b) Nav gava bi edatêni li, ji, di.. de, di, re, ji... de, ji... re, bi.. de, bi.. re, bê bikaranîn her gav tewandî ye.

Ji malê	yan jî ji welatî
ji welêt	yan jî ji bajarî de
di bajêr de	yan jî ji bajarî de
di avê re	yan jî ji çiyayî de
ji çiyâ de	yan jî ji çiyayî de
Ji Xezalê re	yan jî ji Kemalî re
Ji Kemelî re	yan jî bi bayî de
bi bê de	yan jî bi şivanî re
bi şivê re	yan jî bi şivanî re

c) Gava nav di nav cumlê (hevokê) de bê bikaranîn, li gor transîtîfi(geçişli) û intransîtîfiya(geçişsiz) fiilê(lêkerê) û li

gor demê, halê tewandî û xwerû yê, navê ku fail e(özne) yan mefûl (nesne) e tê bikaranîn. Qaide li gor jêr in.

a) Di fiilê intransîtîf de:
Di hemû deman de navê ku fail e xweber e. Mefûlê cumlê nîne. Navê ku..serve (complement tumlec) ye li gor herdu qâidîn jor tê tewandin. Kişandina fiilê li gor demê û şexsan tê guherîn. Ji bo ku fail xweber e nabe pirejimar(navê Kurdî gava di halê xweber de bin tu caran nabin pirejimar, her yekejimar dimîn). Halê pirejimarî yê fail bi fiilê tê diyarkirin. Yanî fiil li gor pirejimarî an yekejimariya fail tê guhertin. Hin mîsal li ser fiila intransîtîf:

Ez ê biçim malê
Ez dê biçim malê. Azad ê biçim malê
Ez diçim malê. Azad diçim malê
Ez çûm malê. Azad çû malê

fail yekejimar e fall pirejimar e
Şivan diçim malê. Şivan diçin malê.
Şivan çû malê. Şivan çûn malê.

b) Di fiilê transîtîf de:
Grûb I: Di demen niha, fireh û pêş de: Navê ku fail e xweber e. Navê ku mefûl e tewandî ye. Ji bo ku fail xweber e nabe pirejimar. Yanî fiil li gor şexsan û demê tê guherîn.
Her wekî:
fail yekejimar e

Ez ê kitêbê binivîsim.
Azad ê kitêbê binivîse.
Tu kitêbê dinivîsi.
Zelal kitêbê dinivîse.

fail pirejimar e

Em ê/dê kitêbê binivîsin.
Nivîkar kitêbê dinivîsin.
Zelal kitêbê dinivîsin.
Azad ê/dê kitêbê binivîsin.
Kurd dê/wê dîrokê binivîsin.

Grûb II: Di hemû demen buhuri de Fail tewandî ye. Navê ku mefûl e xweber e. Ji bo ku mefûl xweber e nabe pirejimar. Loma halê pirejimarî yê mefûlê di fiilê de diyar dibe. Yanî fiil li gor pirejimarî yan yekejimariya mefûlê tê guherîn.

Nimûne:
mefûl yekejimar e

Min kitêb nivîsi.
Me kitêb nivîsi.
Azadî kitêb nivîsi.
Zelalê kitêb nivîsi.
Şivîn berx bir.
Şivanan berx bir.

mefûl pirejimar e:

Min kitêb nivîsin.
Me kitêb nivîsin.
Şivîn berx birin.
Şivanan berx birin.

Rêexistina nasyonalist a ku di bûyerên berpêçûna Serihildana Şêx Seîd de rol leyîst Civata Azadiya Kurd bû ku paşê bi navê Civata Xweseriya Kurd hat bi navkirin û jê re bi kurtî Azadî dihat gotin. Van Bruinessen xwe dispêre wê yekê ku Azadî di 1923'yan de hat avakirin, lê belê raporê leşkerên Kurd ên ku di 4'ê İlona 1924'an de li Beyt Şebabê(Beytuşebabê) tevî serihildanê bûn, ji ıstıxbarata Brîtanî re gotibûn ku rêxistin di 1921'ê de li Erzurumê hatiye danin.(1) Ji roja ku li Anadoluyê wek rêxistinê destpêkiriye, bi rastî tu agahdarî li ser "Azadî"yê nînin û mesele tarî maye. Van Bruinessen zanayê pêşin e ku girîngiya wê işaret kiriye. Pênc qaçaxêñ eskeriyê yêñ ku istixbarata Brîtanî agahdariya herf pirtirin ji wan girtin, Alî Zeki Îbn Welî, İsmâîl Hakkî Efendi Îbn Muhammed Ali(Mûsil), Îhsan Beg Îbn Nûri Beg(Bitlis), Tewfik Efendi Îbn Hasan(Mêrdîn) û Ahmed Rassim Efendi Îbn Mikdat(Can) bûn. Hemû zabit bûn ku di "Regimenta" Hijdan "Divisana" Duduyan a Ordiya Heftan de xizmet dikirin. Îhsan Nûri, Tewfik Hasan û Ahmed Rassim Efendi çavkaniyêñ agahdariyên derheq Azadî yê de bûn.(2) Herduyañ pêşiyê kapitan (yüzbaşî) û yê mayî Mlazimê duduyan (ust teymen) bûn. Ger Azadî ne di sala 1923'an de lê di sala 1921'ê de hatibe avakirin, wê mane ew be ku Serihildana Koçgiriyê û encamêñ wê û endişe û nerazîbûnêñ ku li herêma Dêrsimê dewam kirin wê ji yê rûdanêñ siyasi yêñ navbera 1921 û 1923'yan zêdetir bi tesîra berhemêñ wê(Azadîyê) bin.

Li gor van zabitêñ Kurd, berhemêñ Azadîyê encama gelek faktoran bûn.(3) Divê bê işaretkirin ku zehmetiyek muhîm hebû ku ıstıxbarata Brîtanî karibe agahdariyên zabitêñ Kurd kontrol bike ku li gor wan çawa û çima Azadî hatibû danin; lê agahdariyên ku wan dabûn, derdikeye ku gelek rast bûn. Kurdan gotibûn ku Azadî di sala 1921'ê de li Erzurumê ji alî Mîralay Xalid Begê Cibrî fermandarê kevn ê garnîzonek Erzurumê ve hatiye danin. Şax û şûbêñ din di bin kontrola şaxê damezrêner de hatibûn avakirin. Hejmara liqan û serokêñ wan nihîn(sirri) dihatin girtin û zabitêñ Kurd idia dikirin ku ne agahdar in ka gelo çend liq hene. Wan dizanibû ku liq li Diyarbekirê, Sêrtê, Stenbolê, Dêrsimê, Bitlisê, Karsê, Xinisê, Mûşê, Erzincanê, Malazgîrdê, Xarpûtê û Wanê hene. Kurdan texmîn dikirin ku Sêrt pênc şûbêñ wê, Bitlis dudu û Wan heft şûbêñ wê hene; tevî ya Beytuşebabê bi tevayı dikirin 23 şube. Xalid Begê Cibrî(Erzurum); Cemîl Paşa Ekrem Beg(Diyarbekir); Kor Huseyîn Paşa; reisî eşîra Heydehan(serokê şuba Menazgîrdê); Xalid Begê eşîra Hesenan(serokê şuba Wanê), Hecî Mûsa Beg(Mûş, reisî eşîren Mûtîk û Xwîti); Bayt Hecî Bayram(eşîra Şîrnx); Eyyub Beg(Mêrdîn, ji eşîra Milan), Faris Isa İbrahîm Axa(nêzî Mêrdîn, ji eşîra Dekûri); Mahmûd Beg İbn İbrahîm Paşa(eşîra Millî) û Simko; serokê bi navûdeng û Şîrnx(divê Şîkak be, xwiyaye şas hatiye nivîsin N. A) hatibûn

binavkirin.

Raporek dirêjtir di derheqê Azadîyê û serihildana Beytuşebabê de, ji alî "Colonial Office" de di 27'ê Çiriya Paşîn(November) de gihaştibû. Ev rapor ji rapora 8'ê Çiriya Paşîn ku di derheqê endamêñ Azadiyê de bû, zêdetir agadarî dide, her çî liste ne temam be ji.(4) Ji navêñ ku di rapora 8'ê Çiriya Paşîn de ne zêdetir ji bo Erzurumê heft navêñ din ji têñ dayîn; Abdul Rahîm; awuqatek (Stenbol) û Seyid Abdulkadir (Serokê Şûba Stenbolê); Taşgîrd (nav nayê dayîn); Reşîd Efendî (Xinis); tevî Ruşîd Efendî(serok); Mûş(nav nînin); Hecî Hesen, Hecî Dursun Axa û yekî bi navê Abdurrahman(Bitlis), yê paşîn ji eşîra Şîrnx bû û wê wextê li Sêrtê di hefsê de bû. Wan, ji Mulla Abdulmecîd Efendî(serok) pêşir şes endamêñ wê hebûn. Sê endamêñ din li Cizîrê, dudu li Mêrdîn, pênc li Diyarbekir ji Cemîl Paşa (serok) pêşir hebûn. Ü her wiha şûbêñ Xarpêtê. Agadariyên di hundirê herdû rapor de, xwe dispartin wê yekê ku 23 şûbêñ Azadîyê hebûn û ev bes beşek ji listê bû. Gelek serok di Ordiya Tirk de zabit bûn û geleken endamêñ eşîran di

Kemalîstan pêk hat pirtir hazir bûna.

Zabitêñ Kurd her wiha yazdeh sebebêñ siyasi yêñ ji bo bihêzkirina hazırlıya serihildanek çekdarî ji didin(lî gor formulekîrîna ıstıxbarata Brîtanî). Lîste girîng e, ji ber ku yek ji wan bes du yan sê çavkaniyan e ku sedemêñ nerazîbûn û daxwazêñ Kurdan ên ku rê vekir li serihildana Şêx Seîd diyar dike:

1- Hê nuh danîna qanûnê nuh di derheq equaliyetan de ji bo Xiristiyanan, ev niyeta hukûmeta Türk diyar dike ku dixwaze hemû nifûsa Kurd a Wilayetê Rojhîlatê biguhêze Anadoliya Rojava, wan li nav mihaciran û li nav Tîrnîjadêñ din bi cih bike, bi vî awayî wê navbirra di şirîta Tûrânî de malêse ku ev şirît ji Behra Sîpî dikiş Anadoluyê, Kafkasan, Tarns-Kafkasya û Turkistanê. (Li gor agahdariyan gelek Kurden ku hinekî zêde hişyar bûne, ji Anadoliya Rojhîlat hatine rakirin û di nav mihacîren Türk de hatine bicîhîrîn ji. Ev gaveka pêşin e ji bo hêdî hêdî pêkanîna piraniyek Tirk).

2- Rakirina xelîfîtyê ji alî hukûmeta Tirk ve; ku yek ji wan

6- Tunebûna xizmetêñ qenc ên hukûmetê ji wan bacêñ ku têñ dayîn, tevî vê ji civandina bacê di salekê de ji carekê zêdetir, ne ku kêm caran dibe. Ne di riya ruşwetê re be, li mahkeme û daîran heqbîdestxistin tu carî pêknayê.

7- Destdirêjiya hukûmetê ya nav hilbijartina mebûsan ji bo Meclîsa Milî ya Türk ji wilayetêñ Kurdistanê, hergav wê encamê dide ku mebûsi bi fermanêñ hukûmeta Türk bêñ hilbijartin ne ku li gor hilbijartina azadî ya gel.

8- Siyaseta Tirk ya rawestandina eşirek Kurd hergav li hember yeka din ji bo rîlibergirtina yekîtiya qewmî û meylkirina hêza liberxwedanê ber bi daxwazêñ dilê hukûmetê.

9- Èrisen leşkerî li ser gundêñ Kurd, talankirina heywanan û dejenerasyona girêdayî bi ruşvet û xûkiyê ji bo pêkanîna lazîmî û daxwazan.

10- Suîstîmal û muamela xerab a li hember rutbe û dosyên Kurdan di ordiyê de û kurmê(xûya) hilbijartina wan ji bo kar û xizmetêñ giran û adî û wezîfê bêyî dilê wan.

11- Teşbusêñ ji alî Hukûmeta Tirk ve ji bo mêtina dewle-mendiyêñ madenî(mîneral) bi alîkariya sermiyanê Almanan(5)

Tirk gelek hay ji Azadîyê û ji karûbarêñ wê hebûn û bi hêza xwe her tişî dikirin ku wê bipelêxin. Wan hêvî dikir ku vê yekê bi riya veguhastin û bidürxistina (ji wezîfe girtina) memûrîn xwe pêk bînîn yêñ ku li gor wan bawerî pênedibûn û bi riya cezakirina her Kurdê ku şik jê dikirin ku têkiliyêñ wî bi Azadîyê re heye. Mînakek berê ew bû ku Zahnî Beg ê Erzurumî û waliyê Bitlisê hat veguhaztin û Kazim (Karabekir) Paşa qumandarê Tumena Duduyan hat şûna wî.

Li gor ku zabitêñ Kurd digotin, bi hindikayî di dawiya İlona 1924'an de, sê armancêñ esasî yêñ Azadîyê hebûn; xelaskirina Kurdan ji zilma Tirk; dayîna Kurdan azadî û firseta wê yekê ku welatê xwe bi pêşde xin; û bidestxistina desteka Brîtaniya, bi idrakkirina ku Kurdistan bi tena xwe nikare li ser piyan bisekine. Kurdan idia dikirin ku Yekîtiya Sovyetan teklîfa alîkariya wan kiriye lê wan red kiriye, hêjî di wê hêviyê de ne ku Brîtanî wê piştgiriya doza wan bikin. Ji bo biserxistina vê armancê bala zabitêñ Kurd hatibû kişandin ku peywendiyêñ dostaniyê bi Brîtaniya Mezin re deynîn û desteka wan bideştin. Kurd li Bexdayê bûn û têkiliyâ wan li gel hin serok eşîran û malbendêñ girîng ên rêxistinê yêñ ji devê Çemî Xabûrê heta Erzurumê hebûn. Ev endamêñ Azadîyê xwedî selahiyetek temam bûn ji bo karibin wê yekê bi cih bînîn ku Brîtaniya Mezin piştgiriya xwe bide, ji bo pêkanîna tevgeren çekdarî yêñ ku dikaribû ji bal Brîtaniyan bêñ idarekirin. Tevgeran ji bo bideştinâna vê armancê li herêma bakurê Sêrtê destpê kiribûn ji. Zabitan pêşkêşî ıstıxbarata Brîtanî kirin ku li herêmen mayî yêñ Kurdistanê ji tevgeren wek van tevê bibin.

Ji bo bicîhanîna piştgiriya van armancan, zabitêñ Kurd sê daxwaz pêşde anîn; ku zabiteki(efserekî)

Brîtanî tevî zabitêñ Kurd ji Bexdayê biçe herêmen cebhê yêñ ku tevger dikarin bêñ handan (gijkirin); ku rê li Kurdan bê vekirin ku rojnameyekê li Musilê çapbikin wek wasiteyek pûçkirina propagandê Tirkan û cesaretdana bîrûbaweriya şoresserî ya Kurdistanekê; musada Kurdan bê dayîn ku li Zaxoyê merekezekê ava bikin da ku îmkana peywendiyê nêzik û xurt li gel serokesîrên Goyan, Silopî û Şîrnxê bi dest wan de, ew ciyêñ ku di riya wan re Azadîyê dikaribû rojname bişandana nav dilê "welatê wan". Azadî çar hêviyê wê yê serekî hebûn ku armancê wan karibin bi cih bêñ, ger hin tiş bihatana tedarikkirin: ew multacê wê teminatê bûn ku gava biserketin Brîtaniya Mezin li pişt wan raweste, wan bawer dikir ku li ser navê Kurdistanê dikaribû serihildanekî lidarxin ger "ji alî yekî" ve bihatana destekkirin(dawiyê derket ku ev hêviyek li ser hesabekî gelek şas bû) (6) Azadîyê dixwest li her derê Kurdistanê serihildanen piçük tehrîk bike ku hêzîn biyanî karibin rastiya doza wan bibînin, bi delilan idia xwe îspat bikin ya ku dibêje di ordiya Tirk de ji sedî pênciyêñ zabitan Kurdin; di ser her tişî re ger Brîtaniyan piştgiriya serihildanê bikira, wê dikaribû ji ber sê sedeman li herêma Şîrnxê destpêkira; eşîr yêñ herî pêbawer bûn, herêm ji bo parastinê ya herî hêsatir bû û Şîrnx nêziktirin cih bû ji bo hêzîn Brîtanî di Iraqê de.

Her wiha tîrsinî zabitêñ Kurd yêñ Azadîyê ji hebûn; ya serekî ew bû ku Tirk wê li dijî wan hêzîk gelek xurt mobilize bikin bi bahana niyeta li hember Müsilê, bes roja iro wê ji bo pelixandina tevgera Kurd bihata bikaranin. Ev tîrs paşiyê rast vegeeria. Tîrsa duduyan ya esasi ya zabitan ew bû ku Tirk wê wan zabitêñ Kurd ên besdar bigrin û bikujin û serihildanê destpêbibe berî ku dem gîhaştibe. Vê tîrsê yanî pêkhatina vê rastiyê di demek kurt de, Azadî mecbûr kir ku lê bijdîne ji bo alîkariyek acil ji bal Brîtaniya.

Tîrsa zabitêñ Kurd ku meqâmên Tirk wê wan zabitêñ Kurd yêñ naskirî di nav xebata Azadîyê de yan hefs bikin yan bikujin, ne tirsek vala bû, li ser bingehêk xurt ava bûbû. Hetta gavavêtina wê yekê ku ıstıxbarata Tirk destpêkir ku Îhsan Nûri û qaçaxêñ din yêñ ji serihildana 4'ê İlônê ya Beyt Şebabê bâzdabûn, ji çavde bixin, şikê li ser wan peyda bikin. Ev mîsâlek e li ser tîrsa mezîn a Tirkan ji karûbarêñ Azadîyê. Îhsan Nûri di derheq bingehê û armancêñ Azadîyê de yek ji wan her sê agahdariyên esasî bû ji bo ıstıxbarata Brîtanî û tehrîkîre esasî yê serihildana Beyt Şebabê bû. Paşê wê bibûna serokekî binavûdeng û serihildana Şêx Seîd û yek ji serokê serihildanen Kurdan ên ji 1928'an heta 1930'an.

Îhsan Nûri di 1908'an de bû yek ji endamêñ rêxistina "Hêvî" yê. (7) Kolleja Leşkerî ya Stenbolê di 1910'an de xelas kir. Di 1919'an de li Geliboliyê li hember zabitêñ Tirkan serî hilda (sedemêñ wê di

Avabûna "Azadî"yê

Robert Olson*

Hemîdiyan de fermandarî(qumanadarî) kiribûn.(Binêre zêdeyiya I'an ji bo tevayıya lîsta endamêñ Azadîyê li gor İlona 1924'an û zêdeyiya II'an lîstek zabitêñ Kurd ku pişî serihildana Beytuşebabê ji eskeriyê reviyen pena birin cem Brîtaniya li Iraqê) Zabitêñ Kurd gelek emîn bûn ku "ji ber sedemîn miletpewriterî û yên dîn hemû eşîr wê piştgiriya wê (Azadîyê) bikin". Navê serokesîrîn ku wê piştgiriya Azadîyê bikin wek serokên şûban ji hatibûn tespîtkirin. Gelekîn van eşîran li herêmen Bitlis, Wan, Mêrdîn û Şîrnxê diman. Zabitêñ Kurd bawer dikirin ku eşîren herêmen-Malazgîrd, Bitlis û Mûşê xwedîyê 5.000 çekdar in. Azadîyê, her li wê herêmen ji Tebaxa 1924'an vir de bi aktîfi piştgiriya serihildana eşîran dikir. Di netica vê de, tu hêzîk Tirk a di bin 200 kesan re nikaribû ji Mûşê here Bitlisê. Dihat bawerkirin ku eşîra Botan a herêma Şîrnxê dikaribû ji 2.000 ta sê hezar kesen şerkar rake. Zabitêñ Kurd lîstek zabitêñ eskerî ji xistibûn destê İngîlizan ku gelek jê di Ordiya 7'an de yuzbaşî û mulazim bûn û endamêñ Azadîyê bûn (binêre zêdayiya I'an). Dikare bê dîtin ku encama avabûna rêxistina Azadîyê di 1921'an de Kurd wê li gor serihildana 1921'ê a Koçgiriyê, di ya 1925'an de ku li dijî

çend pêwendiyêñ mayî yêñ navbera Tirk û Kurdan qetand.

3- Di mahkemê û dibistan de hudûdkirina ziman bes bi Tirkî û niyeta qedexekirina Kurdi di pişt re. Ev tedbîr dihatin wê manê ku hebûna hindekariyê di nav Kurdan de êdî nedîma, dewletek menfeetê dima ku Tirk dikirin xwedî imtiyaz. Paşê her wiha medresen dînî ji hatin girtin ku bermayıyên dawî yên çavkaniya hindekariya qewmiyeta Kurd bûn.(Bi vacayiya van gavên jor ên pêpezkirinê hîn ji li herderê Kurdistanê baca (zekata, vîrgîya) hindekariyê tê civandînê)

4-Peyva "Kurdistan" ji hemû

kitîben hîndekariyê hat maliştin û li her derê welêt navên cografi yêñ Tirkî gav bi gav şûna yêñ Kurdi dîgrin.

5- Memûrîn bilind yêñ hukûmetê li Kurdistana Tirkîyê h.w. walî û muteserrif, di filîliyatê de, bê ıstîsna Tirk in û qeymeqam li dora nêvî Tirk û nêvî Kurd in. Her çiqas piraniya memûrîn piçük Kurd in jî Tirk fewqîladet diqet dikir ku kar didin kê û hemûyen ku şika miletpewriteriyê ji wan tê kirin li derive têñ hiştin.(Kurd di wê fîkrê de ne ku Kurdistana Tirkîyê wilayetêñ Erzurumê, Bitlisê, Wanê, Diyarbekirê û Xarpêtê digre nav xwe, ku her wiha wîlîyeta Hekkariyê bêşik divê bê tevlîkirin.)

Zêdeyî -II-

Listâ Zabitên Kurd yê ku pişî Serhildana Beyt Şebabê ji eskeriyê bazdan(Binêre: 23/79, Navêr Kurdi di dokument de çawa hatine nivîslîn wîlo têr dayîn)

Nav	Rutbe	Gîhaşt	Reviya
Abdul Majid	Yuzbashi	20.3.24	25.8.24
Abbas Eff.	Mulazim awal	26.8.24	31.8.24
Khorshid Eff.	Mulazim awal	20.9.24	21.9.24
Ahmed Adib Eff.	Yuzbashi	20.9.24	10.10.24
Ihsan Nuri	Yuzbashi	27.9.24	24.10.24
Towfiq Eff.	Mulazim awal	27.9.24	24.10.24
Rasim Eff.	Mulazim awal	27.9.24	24.10.24
Said Fahîni	Yuzbashi	24.10.24	28.10.24
Ahmed Beg	Qaimeqamê Sivil	25.10.24	
Sayîd Mohammad	Imam	27.11.24	22.1.25
Mohamed Ibn			
Shaikh Abdullah	Imam	12.12.24	12.12.24
Abbas Eff.	Yuzbashi	15.12.24	21.12.24
Shakir	Mamoste	7.3.25	10.3.25
Khalil Ibn Mustafa	Serbaz(er)	8.8.24	
Ahmed	Serbaz	8.8.24	
Abdur Rahman	Serbaz	21.9.24	
Mustafa	Serbaz	21.9.24	
Ali Ibn Shikho Ibrahim	Serbaz	18.10.24	24.2.25
Saleh	Serbaz	1.11.24	
Mohammad	Çawîş	1.1.25	13.1.25
Cholo	Serbaz	17.1.25	3.2.25
Abdur Rahman	Serbaz	17.1.25	3.2.25
Wali	Serbaz	17.1.25	3.2.25
Mohammad Ibn			
Abdurrahman	Çawîş	18.1.25	18.1.25
Jama'a Ibn Mustafa	Serbaz	30.1.25	
3.2.25			
Wali Ibn Ayub	Serbaz	30.1.25	3.2.25
Aziz Ibn Khalil	Serbaz	30.1.25	
3.2.25			
Shukri	Serbaz	30.1.25	
3.2.25			
Ahmed Harandi	Mulazim awal	7.4.25	
Abdul Karim	Mulazim awal	22.4.25	

raporê istixbaratê de nayêni diyarkirin) tevî yên din qumandarêne xwe yên leşkerî ji hefs kîrin û du mehan qumandarî girt destê xwe. Di mahkema orfî(leşkerî) de ji ber vê kirina xwe hat mahmekirin û hat veguhastin ji bo Bitlisê. Berî ku hereketî Bitlisê bike, İhsan Nûrî eşkere tevî Kürt

Tealî Cemiyeti(Komela Pêşveçûna Kurd) bû, û talimat wergirtin ku li Bitlisê, Sêrtê û Diyarbekirê li ser navê tevgîra Kurd bixebe. Li ser emrê Ziya Begê Bitlisê seroktiya serîhildana Beyt Şebabê ya 4'ê İlona 1924'an kir. Raporê istixbarata Brîtanî tu caran Azadi

bi vî navî binav nekirin. Nayê xwiyakirin ku wan di navbera rêtixinek nasionalîsta Kurd û yeka din de ferq didîtin, geleç caran, digotin ku, filan û filanê aîdi tevgîra netewî ya Kurd, her çîqas ew navê rêtixinekê bû ji.

Dûmahîk di hejmara bê de

* Ev nivîs ji pîrtûka Robert Olson a bi navê "The Emergence of Kurdish Nationalism and The Sheikh Said Rebellion, 1880-1925, University of Texas press Austin" hatîye wergerandin.
Werger: M. Alf.

Notên Binî

1- Van Bruinessen zanayê pêşîn e ku işaretî karûbarê Azadiyê kiriye, Agha, Shaikh and State r. 373, 446-447 n. 42; Air Ministry(Air) 23/411: Agahdaryê kevnîtîn yên di heq serhildana Beyt Şebabê de ku bi vî navî dihat binavkirin, di Airê de 23/411 heye ku ji istixbarata hewayî ya Baxdadê hatîye şandin ji bo Qerargeha Hewayî ya Baxdadê. Tarixa wê 8'ê Çiriya Paşin (November) a 1924 e. Listek serokîn serîhildanê berî wê di 5'ê Çiriya Paşin de hatîb qeydkirin. Berî wê du raporê din hebûn ku tarîxîn wan 8'ê Çiriya Pêşîn

(October) û 21'ê Çiriya pêşîn bûn û li gor emrê heyî zabitên istixbarata hewayî bi îmza SSO (Special Service Officers) ên Bexdadê û Musilê hatibûn şandin (no D6 û 10/8/24 û no J/62 û 10/21/84) Rapora Bexdadê li ser çavkaniyê cihêtir ji Kurden agahda hatibû avakirin. Min nikaribû ez van raporan bibînim, lê rapora 8'ê Çiriya Paşin duxuyê ku ji bilî çend detayan bi agahdaryê hundurê wan re li hev dike. Van Bruinessen nivîsiye ku raporek wiha di FO 371, 194, E 11093/11093165 de heye; binêr r. 442 n. 43 û n. 44. Min ev dokument bikarneanî, divê ji eslê

Zêdeyî -I-

Endamên Azadiyê li gor İlona 1924

(Binêre: 5/566; Navêr Kurdi wek ku di dokumentên Brîtanî de hatine nivîsandin, têr nîşandan.

Erzurum

Miralai Khalid Beg (Serokê Rêxistinê Fermandarê Kevn ê Garnizona Erzeromê, niha li Qersê tucar)

Qaimmaqam Salim Beg

Qaimmaqam Kuchuk Kazim Beg

Miralai Kuchuk Ragib Beg

Haji Maulud Efendi

Haji Dorsum Efendi

Qaimmaqam Arif Beg

Abdul Huda Jafar Beg

Arslan Beg Constantinople(Stenbol)

Saiyid Abdul Kadir Effendi Serokê liqî

Abdul Rahim Awuqt

Kars

Yuzbashi Tawfik Effendi Serokê liqî

Bayazid

Shaikh Ibrahim

Melashgird

Kur Hussain Pasha yê eşîra Heyderan Serokê liqî

Vartava(nêzî Melashgirdê) (Varto) Khalid Beg

Serokê liqî, (cihê ye ji serokê Rêxistinê Reisê Kurden Hasserahlî / Hassenanli) û Miralayê alayek Eşîri

Khinis(Xinis)

Rushdi Effendi Serokê liqî

Yuzbashi Rashid Effendi

Mush(Muş)

Bitlis

Yusuf Ziya Beg, Mendûbê kevn Serokê liqî

Binbashi Haji Hassan Beg

Abdul Rahman Agha Şîrnex (Niha li Sêrtê di hefsê de ye

Haji Dorsum Agha yê Mûşê

Van(Wan)

Mullah Abdul Majid Effendi Birayê Mullah Sa'idê Kurdi (serokê liqî)

Sa'dun Beg, Kara Hisar Serokê eşîra Hassaran

Binbashi Arif Beg, Şamsîki Serokê eşîra Şemsîki

Alî Beg Birayê Arif

(Not: Di destpêka Îlonê de hat bihîstîn ku Mullah Sa'idê Kurdi yê bi navûdeng ji bo di ser Bitlisê re biçe Wanê Stenbol bicî hişt)

Sairt(Sêrt)

Yuzbashi İhsan Beg Serokê liqî

Haji Abdullâh Effendi, tucar Sêrt

Darwish Beg, Mufetişê Gümrukê Sêrt

Qaimmaqam Razzak Beg Niha qeymeqamê Bilajikê. Ji alî

waliyê Anadolê hat şandin. tequad

Miralai Wais Beg

Shernakh(Şîrnex)

Sulaiman Agha (Serokê liqî) eşîra Hecî Bayram

Jazireh(Cizîr)

Haji Dursun Effendi

Abdul Wahab Effendi

Abdul Muttalib Effendi Mudûrê nehiya Silopiye

Diarbekir(Diyarbekir)

Jamil Pasha Zadah Akram Beg (Serokê liqî)

Doctor Fuad Beg

Abdul Ghani Beg

Doctor Nasim Beg

Binbashi Mstapha Beg

Qaimmaqam Adnan Beg Tumena Suwarî ya 1'ê. Bi esil Diyarbekirî ku li wir wek mîletperwerekî dilsöz tê naskirin

Mardin

Haji Khidr Effendi

Qaimmaqam Khidr Begê

Dêrsimî (Ji Dêrsimê hat şiyandin bo wir)

Fermandeyê Alaya 6'an bû

Erzingian(Erzincan)

Kharput(Xarpêt)

Dersim(Dêrsim)

Kangar Zadah Ali Haidar

(Serokê liqî) (Eşîra ku Azadiyê hesab dikir ku wê piştgiriya wan bike)

Herêma Bitlisê

Haji Musa Beg û lawên wî

Jamil Chatto-

ji Eşîra Paçınar

Shaikh Salahaddin

Mustafa Agha- ji

Eşîra Xerzan

Ali Agha li nik Mustafa Agha

Herêma Wanê

Karawilli Dezgin(Lezgin)

Agha Eşîren Ertûşî

Abu Bekr(Birayê Lezgin)

İsmail Agha Eşîra Gevdan

Umer Agha Eşîra

Mamxuran

İsmail Agha Simko Eşîra Şikak

Shaikh Abd-

Rahman Effendi Eşîra Bervarî

Shahin Agha

Yahya Agha Eşîra Jırkan

Yakub Agha Eşîren Erûh

Herêma Şîrnexê

Ali Khan Agha

Mustapha Ibn Abdul

Rahman Agha Eşîren Hecî

Bayram

Shahin Ibn - Sulaiman Agha

Agid Agha

Umar Timur Agha Serokê

eşîren Batwan

Shaikh Tahir Eşîren Batmanê

Herêma Mêrdinê

Remo Aghayê Zangard

Eyub Beg Eşîren Milan

İsa Agha

Çirok

- 1 -

Vemirtî ne!!

Di dûmana bê agir de, dirikrikin. Di kenê bê deng û kelê de, li hev dipirsin. Bizav nîşana demê ye, lê seranserî giyan dorpeç dibe... Bi naveroka xewnê, xuristê heyinê, bê qudûm belû dibû diwarê bêdengiyê.

Li beranber vê lehiya kor û deyûz, vê bahoza sît û kawik, kî dikare nifirê bêcîr, nifirê kevz bûyî, daqurtîne? Carcaran dilerizîn, tiliyên bi kesera dirokê hinekiri. Tiliyên ku êdi hew dikarin hêşirêney peyrûzî rawestinîn.

- Evîndar... bi girî, bi kûrkûrê bîna xwe vedikin!

- Firmiskênil dil, cerg û çemênhinarîkîn wê eger bêtin zuha kirin, kelem, singoya zingarî, eger ji bibîkîn wê bête hilkirin, pêwîst e tilî jîndar bin... Pêwîst e tilî livdar bin...

- 2 -

Deh tilî tênen serdana hişê wî, û bi sed hawayî hişê cilmissi tê guvaştin.. Wê çawa fêri hejmartina tiliyan bibe?

Di nav reşike tarî de digevize, bê kenar û kinêr, bê sî û stêr, bê şar û sêr. Di aşê evînê de tê hêran. Xwe dispêre piyên wê, lêvîn wê, seqema singê wê, elfebaya xwe ji rengê çavên wê didize gula berberoyê li newqa xwe dipêce û berê xwe, her derê xwe dide guhênen wê:

- Du tilî nîşana serfiraziyê ne.. an xaçekî zêrin in.

- Bi sê-çar tiliyan, mirov dikare zikê yara xwe ji ken bixîne.

Tili

(Bo Rono N. Ş. B)

Ehmed Huseynî

- Ü.. û bi tiliyekê, bi şujinekê, bi serê pêñûsekê; bajarekî ji berfê û kevokan sipehî, xwenperest, tê bombebaran kirin, tê veşartin di bin perda jehrê de. û... bi tiliyekê mirovek -kî be bila bibe- tê kuştin.

Çavek- ci reng be bila bibe- têt rijandin.

Pirsek- ji kî be bila bibe- têt kirin... û evîndarekî dîn dikare bi tiliyekê ji dîlbera xwe, şanî biçük û mezinênaqajîn bide, dikare navê welatê xwe bi xwînê li ser dergehîn qalind di nîvî mirinê de biçirîsine!!

- 3 -

Hê vemirtî ne!!

Vinvina zimanê wî ye. Guhênen wê kewara tiliyan wî ne..

Ü.. mirovîn cengperest ên ku herdem tîvingen xwe nîşanî defa singa berbangê dîkin, ên di şûna hêlinen kew û qulîngan de, hêkîn çavşorî û zikreşiyê datanîn. Ên di nîvî rojê de simbilîn ciwan bi girî vedikin, - bi tiliya xwe ya mezin têne naskirin. Ü.. mirovîn benefş- şilanperest, ên gurz bi gurz çîçek û sorgulan didin ber pozê jînê, ên ku kelehen evînê ji baran û buharê ava dikin, ên di kelkela rîçen dûr de dihelin, ên rokîn rengîn di esmanê dilen xwe

de, di avşoriya çavên xwe de veşartin e - ew ji bi tiliya mezin têne naskirin- Du tiliyên mezin wek hev nînin.

- 4 -

Hêdi-hêdi dem, cîhan ji nav terkîn tiliyên wî direve û- ji nişkê ve- bi ser xencera hişê xwe de dişemite.. Kê ev lehiya dîn û deyûz aferandiye? Di wê neqebla tenik û teng de. Di wê bizava tûj û dirêj de. Toza zaroktiyê qermîçekîn mîjîyê wî mist dikir. Cermê dilê wî duxurand "Şeştilî" xwe çem dikir ser doşeka bîra-nînê.

Ho...ho ŞEŞTILÎYO!!

Tu serokekî ne nas bûyî... Tenê palan, perîşanan parsekan ji te re digotin:

Tu jîrîkê vê serdema orospiyî: De we re lo!!

Çend tîrenen genim, ceh, pembo, di ser şîvîn pişta te re derbasbûn? Çend çemîn xwêdanê, axînê ji moxila laşê te, herikîn, zordest û xwînmijan piyalen meyê pê şûştin?

Ma rast e "Şeştilî yo"!?

Xelkîn vî bajarı li hev digerinîn û dibêjin "xurtiya te, hêza te ji ber tiliya şesan e ? Di zaroktiya xwe de kolan bi kolan, firoşgeh bi firoşgeh li şeştilî digeriya lê kerr û gêj dibû carcaran li hev

rast dihatin. Ziq li destê şeştilî dinêri. Kela dilê wî hênik nedibû. Çavên wî bi dû tiliya" "Şeştilî" de a şesan, bazdîdan û pêre diçün...diçün...diçün.

- 5 -

Vemirtî ne!!

Diponije, bîranîn ji serê tiliyan dunuquqtin. Zengilê di xwîna wî de dengê dilopan ezber dike.

- Dayika ku bîna wê ji darên hinaran diffüre..

- Sindoqa bûkaniyê, mişt benî û bastêq e

- Çirika bîrê, ava şêlû, qurta yekem.

- Mîrîşa ku dida dû pişta wê ta hêka xwe bi lez bîghîne tiliyên wî..

Û dawî, welatê ku xwe jê vedizi, yara ku ji maça wê têr nebû!!

- 6 -

Rûpelîn çavên wê li ber bayê tiliyan tenê hejandin.

ENKIDO! bo ci tiliyên te bi êşa jîyan ketin?

SOKRAT! Bo ci piyala jehrê tiliyên te dinasîn?

ZERDEŞT! eger esmanê BELEX ê hê bi qiralek û başokan nehatîbe cotkirin, eger dil bê cejn û govend be, eger lêvîn wê, serê meikîn wê ên pembik û step di nav serê tiliyên vemirtî de neyên mistkirin??

Helbet..ku çav ziq li çav binere.. dil ziq li dil binere.. Tilî ziq li agir binêrin....wê liv û bîzav ji nenûkan dest bi hilatê bikin.

- 7 -

Di navbera çavên wê û tiliyên wî de, aso bi xwîleyê dihat ristin di wê asoya kerrikî de cîhan bi kurtayî duxuya. Qiraxen wê cîhanê, bi oxira şikestî xwe li ba dikirin..dengê wî -şermok û şiyatok- di nav xirecira hêşirên

wê de, winda dibû. Peyvîn wî, bê tam ji serê tilikan dipengiznû di asoya evînê de nimêj dikirin, xwe bi rondikan şad dikirin:

Pêwîst e evîna xwe ji bayê resj, ji pencen sedsalîya bîstan biparêze.

- Bawer ke "ezî bi vî desî bi van herçar tiliyan jîndariyê li dar xim.. Û tu carî ezî li hember lerzê na..na vemirîne radest nebim! Werzîn tîrsî di dil de, di zimanê wê de stîrkîn birîndar li bin guhê hev diketin kurte-pistî di lêvîn wê de nivîya:

- Tilî çar bin an koremar bin, ji bo evînê, evîna min û te ne serêşek mezin e. lê nenûkek dikare dil -di çav girîneke de- rawestîne.

- 8 -

Hin bi hin, tiliya ronahî mijtin. Nenûk geştir bûn. Lerzê hustuxwar kir. Çavên wî li revê bûn, lê tora dilê wê hin bi hin, lê dihat hev.

Tiliyan radipeline bilalûkên azadiyê di sînorê herçar tiliyan de bê armanc. Kêfaretê dike, dilukume dikeve, di gindire, radibe, bi rabûna xwe re bejna êşî dipîve. Li ser qamira sînoran axîna ku tîr belav dike û dide ser pişta xewnê..çû..çû..çû

Li malzarka xwe dipirsî, li toza zaroktiyê digeriya.. û gava nêzîki dara hînarê bû û serê xwe danî ser bîna dayika xwe, banga melê ew rakir ser tapanan:

Ehlî xêrê!! Şeştilî 'emir da we. Laşê wî li Camiya Mezin e, ê ku bê bi xêra xwe li ser nimêj ke, wê Xwedê xêra wî binivîsîne...

Zû bi zû rondikan xaçîrêkên xwe di kezeba wî de nas kirin...û zû bi zû pê hesiya ku tiliya xwe di nav porê wê de ji bîr kiriye.

ŞEWLÊ MEZRAYI

Resîdê Kurd

Şewl bia Den kir, çûn Zeynkulek xuestin û anîn. Pir neçû, şahê Ecem leşkerekî giran şand ser Şewl Mezarayî, çûnki Şewl mîrekî pir kîrhaşîbû, şah nas nedikir û serê xue jê re danetanî. Pistî şerekî giran û kuştinek pir ji Eceman, Şewl birîndarbû. Ecema dora wî girtin, destê wî kelemçê kirin, lingê wî li bin zikê qantirekê girîdan û birin.

Şah çavê Şewl derxist û kir seyîse hespê xwe. Mehînek Şewl hebû pir baş û bezab û, li mal bû, navê wê Belekê bû.

Pişî girtina Şewl bi çend mehekê, Zeynkulekê kurek anî û Belekê ciwaniyek mihiñî anî. Navê ciwaniyê kirin Beleka ji Belekê û navê kurik ma lawê Zeynkulekê.

Kurik mezin bû, çû nav zaroka, li gedeyen gund xist. Diyîn zarokan pir jê xuî kirin, xeyidîn û gotin :

- Heyho ! ev sêwî yê bê bav ji ku ji me re hat ! Her ro, du ro li zarokan me dixîne...

Kurik giryâ û bi ser di ya xue de hat û got :

- Dayê, ma ez lawê kî me ? Eger bavê min heye, ka rê min bide. Diya wî got :

- Lawo, çîma li bavê xue dipirsî ?

Got :

- Pîrek û zarok giş ji min re dibêjin "tu bêbav i" ..

- Lawo, bila bîbêjin. Dev ji wan berde.

- Dayê, bi Xuedê, tu ji min re nebêji, ya ezê xue, yan ji te bikujim.

- Lawo, Şahê Ecem bavê te girt û bir.

- Ma çawa ezê wî bibînim ?

- Şahê Ecem çavê wî rijandiye û kiriye seyîse hespan.

Li ser vê lêwik karê xue kir û, rojekê, oxirxueşî ji diya xue xuest, li ser mihiñî xue suwar bû û berê xue da welatê Şahê Ecem û çû. Gîhaşt bajarê ku Şah lê. Ji xelkê pîrsî, got :

- Bêtarekî hespa li vir heye, gelo li ku ye, ezê mihiñî xue rê bidimê.

Rê danê, çû gîhaşt ba seyîs û got :

- Apo, qe ji ciwanmîrî ya xue tu li vê mihiñî min binêre.

Şewl destê xue di ser pişta wê re bir, serê wê, lingê wê, simîn wê giş pelandin, got :

- Lawo, ka destê xue bide min ez te ji bipelînim.

Kurik destê xue dayê, Şewl destê wî girt, peland, dama û got :

- Lawo, ka li dora xue binêre kes li van dera heye, an na ?

Lêwik got :

- Na kes tune

- Ger ne şaş im, mihiñî te Beleka ji Belekê ye û tu ji lawê Zeynkulekê ye.

- Rast e, tu bavê min i, ez hatime te birevînim.

- Lawo mihiñî xue di hundur de girêde êm û ava wê di hundur de bidê. Her roj, tîmar û qesawî bike heya cil rojî. Pişti cilî bîne ba min.

Kurik wek jê re hatî gotin kir. Pişti cil rojî anî ba bavê xue. Şewl mihiñî peland û got :

- Mihiñî te hîn pê maye , cil rojî din xuedî bike.

Cil rojî din xuedî kir, baş tîmar û qesawî kir û anî ba bavê xue. Bavê dîsa mihiñî destê xwe lê peland û got :

- Mihiñî te içar baş tîmar bûye, kare me herdyan xelas ke. De lawo, sibe cirîde, tu ji têkeve nav suwara, lê mihiñî xue nebezîne. Ezê li ba cirîdê bim, ku tu hat ba min, min bavêja paş xue û bajo.

Sibê, lawê Zeynkulekê ket nav suwaran. Ku gîhaşt ba bavê xue, destê wî girt û avêt paş xue û ajot. Li suwaran bû gazî, gişan dan pê, lê mihiñî yekayek jê man, heya çaxekê kurik got :

- Bavo, mihiñî boz nêzîkiyê li me dike.

- Lawo, bavêje nav kepîra.

Mihiñî boz di kepîra de kêm kir û ma. Pişti çaxekê, got :

- Lawo, ka li dû xue binêr.

- Bavo, mihiñî şê her ku diçe nêzîkiyê li me dike.

- Lawo, bavêje nav histîre mişka. Şewl pîrsî û got :

- Lawo , mihiñî şê hîj li pê me ye, yan na ?

- Na, bavo. Ji me ma, nema kare bibeze.

- Lawo, ka binêre kes li pê me ye, yan na ?

- Bavo, mihiñî kumêt, kab-resj li pê me ye. Hin bi hin me bi ber bi xue dikşîne, çiqand dikim nakim ji ber dernakevîm.

- Lawo, bâ

Jînenîgariya Reşîdê Kurd

Perwîna Reşîdê Kurd

Reşîdê Kurd kurê Mihemedê Reşo û Zîna Xêlid ;e. Dêya wî ji Amedê ye. Navê jîna wi Xatûn e, keça Mûsayê 'Ocê, ji gundê Til Tînê nêzîkî Dêrikê. Sala 1910 li gundê Roşatê; navça Dêrikê Reşid te dinê.

Reşîdê Kurd xwendina xwe li gundê Dêrikê, li Mêrdinê û salekê jî li Dibistana Qonyayê dike. Sala 1930 berî kutakirina xwendina xwe ya mamostatiyê bi çend heyvan têye girtin. Demek naçe rî dikevî, ji zindanê direve û xwe ji berçavan hinekî dide alî. Pê re, di wezteke kurt de ji nû ve têye girtin, û bi meş teve neferekî wî disînîne zindana Dêrikê. Bi rî de dema ku di çiyê re derbas dibin, cendîrme radibe zincîra desten wî vedike. Reşîdê Kurd dikare bireve, lê hemâ nîhadâ(wîjdanê) wî qebûl nake ku paşê cendîrme di bin wî barî keve.

Piştî işkencekirineka dijwar, wî çê dikine binê zindanê. Pê re, haya wîçê dibe ku dikin wî bi dar ve xînin. Reşîdê Kurd radibe karê xwe dike û careke din ji zindanê direve. Bêtirî heyvekê xwe wedişere heya ku rî vê dikeve û sala 1940-i sînor dibirre û derbasî Sûriyê dibe. Demekê li gundan dimîne û dawî li Amûdê bi cî dibe.

Piştî derketina wî ji Kurdistana Bakur jîna wî, Xatûnê, zarokekî tîne. Di wê navê de rojekê, cendîrme hêrisî ser malê dikin û bi lingan û pînan lê didin. çarşefê ji ser wê davêjin û dibêjinê : "ka Reşid i li ku ye?". Ew tênaqîheje ci jê dipirsin. Bi daran li destê wê dixin, dest heya demeke dirêj pûç dibe. Ji ber saw û tîrsê şîrê berê wê diçike û zarok ji nêza piştî du heyvan dimre. Çend meh naborin bavê Reşîdê Kurd, pê re dêya wî ji dimirin.

Kebaniya wî, Xatûnê, û seyê kerîyê pezê wan ê ku hema dewarek bi tenê ji jê nema bû, bi tena serê xwe dimînin. Diya wê tê û wê dibe û diçê. Se bi pê dikeve, di nîvê rî de Xatûn li sê vedigere û hêstiran dîbarîne û dibêjê : "heywanê dîlsoz , nan û xwêya di navbera min û te de ji qut bû, de vegere tu ji ku ve hatiyî, bi wê ve here, bi xatirê te". Se çoga ber dide erdê û bi çavine tiji keder li wê dînhîre, heyanî reşanîya wê wenda dibe

Reşîdê Kurd, sala 1946'an bi dîzi vedigere Kurdistana Bakur û diçê ku jîna xwe bîne. Reşîka pirtûka xwe Rêzimanê didê û dibêjê: "Pirtûkê bîbe û here Sûriyê. Ger te ew derbas kir û gîhande gundê Te'likê (nêzîkî Dêrbêsiyê), te jiyanâ min xelas kir, ra ku (1) ez xelas nebim û ez werime kuştin". Xatûna bîst-û-yelek sañî pirtûkê dike nav baxçika kîncîn xwe û weke zarokekî li pişta xwe daîne û dide rî û bi tena serê xwe sînor derbas dike. çax payîz e. Bi pîrsan ji vî gundi û ji wî gundi heya ku li dawiyê dike roava û digihê gundê T'elikê. Piştî heyvekê ji hatina wê Reşîdê Kurd jî ji Kurdistana Bakur vedigere û li Amûdê rûdinîn. Bi navê Reşad Mihemed E'lî xwe di kutika (2) Sûriyê ;de qeyd dike, ji ber ku hikûmeta Tîrkiyê bi navê Reşîdê Kurd li wî dikevi.

Sala 1949, rîjîma Sûriyê wî

digre û dikşîne Girtîgeha Tedmurê û şes mehan hukmê karên zehmet didinê. Sala 1950, ji zindanê derdikeye lê her tim peyayê rîjîmê li pê wî ne. İca, Reşîdê Kurd li mala xwe xew nake û li gundan dimîne. Roja pêncê derketina wî ji zindanê ji gundan vedigere mal û dîsa tê girtin, tê işkence kirin û paşê ber didin. Kurt, gelek caran, Reşîdê Kurd di dema hukmê Edîb Çîçeklî (1951-1954) de, an di girtîgehê de işken-cê dixwe, an besdariya xwepê-şandanê dike.

Reşîdê Kurd di xebata siyasî de gelekî i germ bû, bê rawesta dikoşa. Bi piskulâtê li ser gelek gundan digeriya û dixebeitî. Piskulâtê pir alîkarî pê re dikir: "Zivistanê ez piskulâtê û heriya pê ve hildigrim û havînê ew min hildigre û li gundan digerîne". Carekê sala 1957 çaxa bi piskulâtê ji Dirbêsiyê diçê Amûdê bi rî de, piskulât dikeve, lingê wî dişkê.

Cîran û kesen ku malen xwe bi kirê didanî, ji tîrsa hêrisen rojane yê polîsên rîjîmê li ser mala Reşîdê Kurd, her tim mala wî ji cem xwe derdixistin û dîqewtandin . Sala 1958-an, diçê İraqê û li wir penabertiya siyasî daxwaz dike, lê hemâ deshelatdariyê İraqê wî dîgrin û dispêrine hukmeta Yekîtiya Misir û Sûriyê. Wî disînîn Merkeza Dudiyan a Qamîslê, li wir bi êliktrîkê û lêdanê tê işkence kirin, bi kendiran bi koka darekê ve girê didin û sê rojan wergî girêdayî li ber germa Tîrmehê bê xwarin û bê vexwarin dihêlin. Piştî ku Merkeza Dudiye hêviya xwe dibirre ku Reşîdê Kurd tu tişti li xwe nane, wî û hevalekî wî bi neferekî re disînîne Girtîgeha Mezeyâ Siamê. Ew neferê hane xorkejî ji Şiamê bû, bi rî de li nav kolanen bajêr zincîren desten wan vedike û herdyan dibe mîvandariya xwe. Roja dinê Reşîdê Kurd û hevalê wî dixin Girtîgeha Mezê.

Sala 1949 di girtîgeha Tedmurê de nexweşî li kezeba wî dixe û hin bi hin nexweşîyê kezeba wî diperrîtan û Reşîdê Kurd dida bin xwe. Sala 1967-an, ji bo dermankirina xwe, Reşîdê Kurd diçê Romaniyê; heyvekê li Bulxaristanê xwe derman dike, lê bê havil e. Berî koçbarkirina xwe bi çend rojan berfê erd sipî kir, jîna wî û keça wî ya mezîn dikevin bin piyan û radikin ser lingan, di nava derfî re li dûr dinêre - jiyan pê şerîn dibe, destê xwe jê nabin nemaze kesen mîna Reşîdê Kurd ku pir hêvî û bûne ber xwe, berê xwe dide jîna xwe dibêjê : "çiqas xweş û rind e!"

Kata pêncê sipêdê, roja Şemiyê, 20 Çile (janvier) 1968-an, Reşîdê Kurd çavên xwe dide hev.

Di ber nexweşîya xwe de Reşîdê Kurd digot : "Pir karûbar li min mane ku ez bikim, min ew hêv bi serî nekirine. Ne gerek e ez niha bimrim

Gerek e ez vegejîme baxçen Dêrikê ;ku min ji mîj ve bîra wan kirine, paşê bila mirin were!", lê venegerîya.

Keder ji vê kederê girantir !!!

Amûdê 12 Gulanê 1990

Zînê ji Erebî

wergerande Kurdi

BASÊN BÊRÛTÊ

Zivirîn çerk,
bas liviya,
dolab geriya.
gêr bû bas,
bas firiya...
Wek colek berx
rêwî
bi ser hev de bûne kerx...
Hin rûniştin, hin ji piya
bi çeng ve daliqîn,
qor qor siksikîn,
pev zeliqîn...
- Nere bas!
Here bas!
Şofêr
zirezop,
çav li seri bûne tas!
Bi Tirkî dike çér:
- Kuro, ka bijmîr!
Çend kes ?
- Bîst û neh
- Eh !
Bajo bes !
Liviya bas,
gêr bû bas,
kilek li pêş.
du kil li paş,
hejîyan bîst û neh laş...
Motor;
ji ba Morgan.
Karesor:
Hosta Vartan
li ser
çar dolavan
bi textan
şingirandiye...
Bi giştî deh peya,
rûnişti...
Ên mayî
tev ji piya
bi çenga ve daliqîn,
qorqor siksikîn,
pev zeliqîn...
- Nere bas !
Here bas!
Şofêr
çav lê bûne tas...
- Hop!
Berdestî mîna top
Got:
- Ne rr...rit
Vaye çar cot
Xirrr...rit...
Lêxist firê...
Hosta Xorê...
Dakişîyan rîwî...
Hilkişîyan rîwî...
Mîna laşen pezkûvî
Bi çenga ve daliqîn
Siksikîn...
Pev zeliqîn...
- Here bas!
Gerbû bas,
kilek li pêş
du kil li paş...
Hejîyan bîst û neh laş...

Bêrût
19. 06. 1964

1 Ra ku : tevî ku, welew,
h eta ku. Teve : di gel.

2 Kutik : deftera nifûsê.

Sexsiyeta edebî ya Reşîdê Kurd

Reşîdê Kurd yek ji berê(neslê) rewşenbîrên Kurden Kurmanc ên destpêka sedê bîstan e. Beşdarbûna wî di Hawarê (Şam) û Roja Nû (Bêrût) de pir kêm e. Di Roja Nû de, hejmar 40, 6 adar 1944, tenê gotarek bi sernivîsa "Stêr" nîvîsandiye. Di Hawarê de gotarek bi sernivîsa "Civat" di hejmara 49 û 52 de belav kiriye.

Reşîdê Kurd bêtir wek zimanzer tê naskirin. Di sala 1956-an de, pirtûka wî ya rîzimane bi navê Rêzimana zimanê Kurmancî ji aliye çapxana Kerem de li Şamê hate belav kiri. Pê re, gava Reşîdê Kurd xebata siyasî wek komünîstekî dike û tê girtin, ew xerîkê nîvîsandina helbestan jî dibe. Li sala 1959-an, dema ku Kolonêlê Sûrî; Ebdil Hemîd Serrac yekîtiyê bi Misirê re datîne, hingê Partiya Komünîst a Sûriyê li dijî wê yekîtiyê derdikeye û buhayekî pirr dide; endamên partiyê ji aliye polîsan ve tê rapêkirin, girtin û işkence kirin. A dinê, Partiya Komünîst razî nabe ku xwe bide pişivandin, wekî çawa siyaseta Xuruşov hingê wisa dixwest. İca, desthelatdarên Sûriyê ên wê demê dest bi girtina komünîstan dikin. Hingê Xalid Begda; Sekretêrê Giştî yê PKS difire Mosko. Reşîdê Kurd jî yek ji wan komünîstên Kurden Sûriyê ye ku tê girtin.

Di girtîgeha Mezê de li Şamê, Reşîdê Kurd van helbestan dînivîsine: "Bersiv", "Oktobir", "Sor im", "Riya Azadan", "Roja me", "Karwan" û "Zindan".

Ev her sê helbesten mayîn jî : "Basen Bêrûtê", "Eger em nebêjin ay, ew ê bibêjin ay" û "Ez" li dervayî girtîgehê nîvîsine. Helbesta "Ez" û "Riya azadan" di Rya Teze, 27 Çiriya Pêsin 1966 de belav bûne. Reşîdê Kurd helbesten xwe di girtîgehê de bi zimanekî tûj nîvîsandine. Gava ku diçe Soyestistanê û dixwaze van helbestan di Rya Teze de bide belav kiri, navê xwe yî rast diguhêrîne û li şûnê Cûnê Reş bi kar tîne.

Reşîdê Kurd komünîst bû û di helbesten xwe de bi awakî eşkere xwe komünîst dibîne. Helbest bi zimanekî serrast hatine nîvîsandin. Tevgera helbesta Kurdi ya wê demê wisa bi tevgera siyasî ve pirr nêzîk hatibû girêdan. Bi giliyekî dinê, helbest serûber ketibû xizmeta siyasetê. È helbestvan helbesten xwe li gor dûşa xwe ya siyasî dînivîsand û propaganda wê dikir. Reşîdê Kurd jî wekî Cegerxwin û Apo di yek êkolekê de ne, eger em çend durvîn taybetî yê her yekî niha deynin aliye. Babeten serekîn ên van helbestan ev in: berxwedan, serketina komünîzmê, işkencekirina di zindanê de, handan û siyarkirina mîlet, yekîtiyê felat, peyrewiya rejîmê Rohilata Navîn ji koledaran re, hwd... Çiroka "Şewlê Mezrayî" jî çirokeke folklorî ye. Heta niha ev çiroka yekî ye, li gorzanîna me, ku Reşîdê Kurd nîvîsandiye.

Ev nîvîs me ji pêşgotina pirtûka Reşîd Kurdê a bi navê KARWAN derxistiye ku ji alî Amed ve ji bo pirtûkê hatiye nîvîsîn, girt -Armanc-

Çirok, helbest û jiyanâ Reşîdê Kurd ji kitêba "KERWAN" ku wê ji alî Komela Jinê Kurdistanê li Swêdê ve bê çapkirin, hatiye stendin.

Hindîk-Rîndîk

Ewê Bibûya Wezîrê Derve

Seydo li Swêdê diçê daîra kar ji xwe re li karekî xedemetiyê-odacîtiyê- digere. Jinika rîber; ma'mûra daîra kar, rojnama ku ilanen kar têde diweşin li ser masê, li orta xwe û wî raxistibû û herdyan bi hev re çavên xwe lê digerînin. Piştî ku çend rûpelén rojnamê di ser hev re digerînin, çavê jînikê bi ilanekî dikeve û ji Seydo re dibêje:

- Vaye ilana karekî ku tu li dikeviya li vir heye. Wiha dibêje û ilanê ji Seydo re dixwîne. Di ilanê de ji kesê ku wê muracaet bike van şertên jîrîn têxwestin:

- Ew kesê ku wê muracaetî vî karî bike divê berê di karekî wiha de xebîti be, xwedî tecrûbe be. Divê ehliyeta wî hebe û zanibe kompîtorê-datayê- bi kar bîne. Li gel Swêdiyeke baş, divê bi ingilizî ji zanibe. Û ku bi Fransızî zanibe wê jê re awantajekê baş be..

Piştî ku jînik xwendina ilanê diqedîne, li nav çavê Seydo mîze dike û fena ku bibêje, "te digot kar tuneye, kar tuneye, a ji te re kar!"

Seydo dibêje:

Ya hurme, ku min hewqas tişt û hewqas ziman zanibuya, ma çîma ezê li vir bibûma xedeme? Ezê biçyama Tîrkiyê û li wir bibyama wezîrê derve.

Amadekar: Z. Xamo

Wanê (2) yew zimanî yew lû bî, mîrati cay kergî, çikalî çî nêverday. Hama ki merxeb bînî, ramitî kîyan miyan. Ewra di kergî xeniqnaynî, ewra di postalê şarî berdî, ewra di çaroxî berdî; cay çî nêverdayî.

Aboasa, aboasa... Wanê rocî waristi -xwi pîze di- wa "Liya wîla mi zav gurey kerdî, ez henî (enî) xwi aqiliya, bes o. Towbe zî esto zanî. Mi handi kergê şarî werdî, mi handi çî-mî tirawito, ez towbe bika deha rind o. Hema ez senî towbe bika? Ez towbe bika ki şera hec bîra. Ella ay towbî bido mi." Ü weristi hema tay teftal-meftalî qoqda xwi ro piştî, heze xafi şidînay, yew gelti pira giroti ow ray kewti.

Ray kewti, gelekî ca şî, tay kergan a dî. De kergî ti ra zav tersenê. Kergî ewnay ki lûw yena. Feqet eno qılıx çî yo ena dawo xwi ro? Kergan wa:

-Waklû!

Wa: -Ha.

Wa: -Aw çî yo, ti ku ra şona? A çî mesela ya?

Wa: -Wila oxil, mi henî towbe kerdî, ez şona hec. Ella qebul ko ez şona hec.

Dîkî wa: -Willah ti şera hec se ez zî to reydi yena. La ki to towbe kerdî, ez şona hec. Hûmay belkî hecê mi qebul bîko.

LÛWA TOWBEDARI (1)

Arêkerdox: MALMÎSANIJ

ez şona hec. Belkî Hûmay towbê mi qebil bîko.

Ay yew dikê zerencan wa: - Liya wila to towbe kerdî, oz to şona hec se ez zî to reydi yena.

O zî rey kewti, bî hîrê tenî. Gelekî ca şî, ewnay yew dodo ha vernî di. Dodoyo neqşenî zî lû ra zav terseno. De lû teyran-meyran veynî cay nêveradanî. Dodoyo xwi ant pê ser wa "Liya ena lûw a. Eno çî qılıx o xwi ra dawo, ku ra şona?" Wa:

-Waklû!

Wa: -Ha.

Wa: -Aw çî qılıx o? Ti ku ra şona? Aw çî hewa wo?

Wa: -Wila oxil, mi cay teyr û tebul nêverdawo werdo, mi zav guney kerdî, oz mi henî towbe kerdî, ez şona hec. Hûmay belkî hecê mi qebul bîko.

Dodoyo wa: Willah ki ti şona hec, ez zî yena.

Bî çer tenî. Tê rey kewti, no pol şî, do pol şî, zav şî, tayn şî; şew ser di amê, şî dekewti yew mixara.

Lû wa: -Eylekînî!

Wa: -Ha.

Wa: -Şîma xwi bidî peynîda mixara, oz xwi dana fekdî mixara. Cay ışan, cinawir-minawir bîro, oz fekdî mixara d' a, oz veynena. Wa şîma nêwero, wa mi bûro. Şîri peynîda mixara.

Înî şî peynîda mixara, oz xwi da fekdî mixara. Pîzedê xwi di wa "mi rê bes î." De lûw a, xûy xwi teriknena?

Gelekî zeman te de şî, şefeqî

ke (kerd) piro do. De wextê se'eridê zerencan o. Wexto ki se'erî beno, dîkê zerencan danê piro wanenê. Dîkê zerencan ê ki mixara di zî da piro wa:

-Qequburo qequburo qequburo, qequbo qequbo...

Lû wa: -Eno çî yo? Eno çî yo qeqqeba to ya?

Dîkê zerencan wa: -Heyran, herçî ê ma, selselada ma di, babda ma di, 'eşîrda ma di, qowmdê ma di 'etiya ('edetê) ma ya. Herçî şefeqî da piro, ma gere se'erî piro dê. Eno se'erî yo.

Lû wa: -Canim ez se'erî-me'erî dînlemiş nêkena! Bê ewta!

Vîye bê cê giro (girot), ant raşte. Ademâqîlî werdow ca di verda.

Wa: -Ez heqlî ya, ya neheq a? De ay bînî se kî, mecbûr î, waci "ti heqlî ya", wa:

-Ti heqlî ya. Da piro şewa bînî şîy yewna mixara di mendî. Şefeqî da piro, dîkê kergan wa:

-Qîqîlû qîmî.....

Lû wa: -Wî! Eno çî yo? Eno çî hewayê şîma wo, şîma nêverdanê ma bûsi. Eno çî "qîqîlû qî" yo? Enka yew bieşnawo, bîro ma ewta veyno, ma hemîni kişeno.

Dîkî wa: -Wila heyran, babda ma miyan di, qowmdê ma miyan di, 'esl û ecadâdê ma miyan di dîkî 'erşan di veyn danê, veng yeno ma, ma zî veyn danê.

Lû wa: -Bê ewta, bê!

Vîye cê giro, gas kerd, o zî

werd. Mend a wû dodo. Yewna şewi yew mixara di mendî, şefeqî ki da piro, ê zî wa:

-Do do do do tirş... Do do do do tirş... Do do do do tirş...

Lû wa: -Wiş! Eno çî yo?

Dodoy wa: -E ma zî wendîşê ma eno yo.

Wa: -Bê ewta, bê ewta! Dodomo, tirş-mîrş, enî zûrî-mûrî ez nêzana.

Wa: -Ti se kena mi?

Wa: -Ez se kena, ez to wena!

Dodoy wa: -Vindi ez to rî yewna qali waca.

Wa: -Waci.

Dodoy wa: -Bewnê ez endi tikîki ya. Ti ko mi di loxmey ka. Doy şarî tirş beno, ma enê wanenê, ê zanê, benê quesnenê, kenê toraq.

Wa: -Enê zûr î.

Dodoy wa: -Zûrî nîy. Di hebî şadî mi estê. Ti waca, ez enka şona gêna yena.

Wa: -Şadî to kam î?

Wa: -Şadî mi yew qaz a, yew zî bett a.

Lû xwi pîze di wa "temam, enê ra çî nêvecêno; goştê qaz û betti hîna zav o". Wa:

-Ti şonê anê?

Dodoy wa: -E.

Wa: -La ki to nêardî?

Dodoy wa: -Mi nêardî qetîle mi to rî helal o. Ez şona ana. Şadanê mi ki şadî day henî qala to manena?

Wa: -De şol! Nêm se'etan miyan di ti yenê!

Dodoy wa: -Wa bo.

Ü da piro ame -mesela- Mehla ... di, persa, wa:

-Tanzi kamî estî?

Wa: -E Şêx Feyzo'y û 'Elikdê Rehi estî?

Dodoy veynda Şêx Feyzo'y û 'Elikdê Rehi da, wa:

-Mi lû dekerda quli. Tanzî şîma şenê lû tebşê, nêşenê?

Wa: -Senê nêşenê? Tanzî ma lû veynê, parçê kenê?

Dodoy wa: -De haydînî!

Wirdîni tanzî xwi meres (?)

kerdî, dodo ver kewtî.

Dodoy wa: -Bew ma şonê -mesela- Mixarada Hesi Gedî. Yewî cor o şerî, yewî cér o şerî; tanzîyan bigîrî yew şerî serdê mixara, yew şerî bindê mixara. Ez zî raşt şona mixara, ez vanâ "werdi, mi qaz û betti piya ardi". A ki amê teber, de şima veyna!

Wila tê rey kewtî şî. Şêx Feyzo'y wa:

-Ez inka ca tebşena. Şêx Feyzo'y tanzî meres kerdi ow 'Elikî zî dim a.

Serbê Dengi ro şî. Yewî şî Mixarada Hesdê Gedî, aw bin zî bin ro şî, tanzî girotî, vindetî. Dodo zî şî fekdê mixara. Lû wa:

-Ti amê?

Wa: -E, ez ama.

Wa: -To se ke?

Wa: -Bew, nanîk î, şo xwi rî bûri.

Lû ki vecay teber, Şêx Feyzo'y tanzî ra wa:

-Teyrê gidi Teyrê! He hay!

Wila Teyri cor di acêr kerd.

Wa: -Tewa ha Tewa!

Tewa zî vazday. Wirdîni girotî, ay visti adê rî, ay visti adê rî. Tanzîyan kerdii, şela (?) ca veti.

Şêx Feyzo herma bide resa, kardiya ca anti, xwi pol a kerd, girotî amê.

Dodoy to zî keyf kerd, ewra ra perra ewra, ewra ra perra ewra.

1)Na estaneki zey vatişê yew Gêlijî nusiyay (Gêl yew qezayê Diyarbekir o).

2)watiş : vatene, vatiş, vatis (wanê : vanê, vanî)

Nê qisandê Ella'y ser ra Cebraîl dano piro yeno derwêşî heti û nê qisan jû bi jû ci rî vano.

Vanê o roj o, no roj o, tay henarî helisîyênê, benê pûç. Sebebê ci zî temehey, çimtengey û nêzanayena qiyimetê meymanî bî.

derwêş şîno darda henalewî ra henarî ci keno û ano ki bûro. Wexto ki henarî keno lete, winêno ki qandê Ella'y jew heba (dendikê) henarî ya bêtîm û ê werdi çinîya. Hebê henarî pêro henarî miyan di helisîyayê, pîrikî girê dayê û henar bîyo pûç, boy-bexê kewta a ser. No 'ecêb maneno, xo heti vano "henaro jewroje senî helisîyêno, pûç beno?"

Cebraîl şîno halê derwêşî Ella'y rî dano beykerdeni û vatenanê ci Ella'y rî vano. Ella hêrs beno, vano:

-Şorî, ê dostê mi rî vaji, newe cayê ey werteyê cennetî nîyo, werteyê cah-nîmî yo.

Cebraîl sebebê ci pers keno, Ella vano:

-Ridê ey ra mi henar kerd pûç. Ney a tepeya henaran miyan di henarî pûçî do tim bibê û tay henarî do bihelisîyê. Sebeb zî o bî. Ey temehey nêkerdê û o henar dari ser o nêverdayê, ci bikerdê û bîyardê mîmandê xo ya bidayê werdeni se mi henarî pûç nêkerdê. Merdimo ki qiyimetê mey-mandê xo nêzano, temehey bikero, o çend zikir û 'ibadet bikero zî rîyê cen-netî nêvîneno.

MEYMANDAREY Dİ TEMEHEY Û HENARÊ PÛÇÎ

Arêkerdox: Koyo BERZ

nêkenê, hal û kîfê to senîn o. Derwêş vano: -Hal û kîfê mi weş o. Ez weş a, silamet a û Ella'y rî dihaci ya. Ez o nê kaffî miyan di şew û roj 'ibadetê xo kena, zikrê xo ancena.

Nê xeylê qisey kenê, derwêş qelbdê xo di vano "No meymanê mi ame, qe çiyêdê mi çinî yo ez ney rî ikram kera û bîda werdeni. Ez meymanê xo ver di şermezar biya. Ez nêzana ez senî bikera û çiçî ci rî bîda werdeni. Hele ez şîra bewnîya a darda xo ya henarî ra. Eger ay ewro henar tepişto, ez henarî ci kera, bîyara ma werte ra lete kerê û zey birayan a pê ra bar a kerê û bûrê."

Derwêş dano piro şîno teber, winêno ki darda henalewî ser o henarî bîyê didi. No sifte şâş beno, 'erbet maneno, xo fek di vano "Ella Ella! Na dara min a henalewî hergi roj henarî tepişte, ewro henarî bîyê didi. Esto Ellay rizqê mi

kerdo bol yan zî no qismetê meymanîdê min o. Ez ney zî meymanîdê xo rî ci kera, ma hergi jew jew henarî bûrê."

No destê xo derg keno ki ê henarî bînî ci kero labelê temehey keno û qelbdê xo di vano "No jew henar ma wirnan rî bes o. Ez ney bera ma bûrê, ê bînî wexto ki meymanê mi şî ez do ci kera û xo rî tenîya bûra."

Ü henarî tenîya ci keno, ê bînî dar a verdeno, yeno zere.

Zere di henarî werte ra keno lete û leteyê ci dano meymanê mi ame, qe çiyêdê mi çinî yo ez ney rî ikram kera û bîda werdeni. Ez meymanê xo ver di şermezar biya. Ez nêzana ez senî bikera û çiçî ci rî bîda werdeni. Hele ez şîra bewnîya a darda xo ya henarî ra. Eger ay ewro henar tepişto, ez henarî ci kera, bîyara ma werte ra lete kerê û zey birayan a pê ra bar a kerê û bûrê."

Derwêş vano: -Verê heme çî jû recayêda mi esta: Ez bol meraq kena. 'Eceba cayê mi cennet di kotî dir o? Ez qayîl a bîmisâ.

Cebraîl vano: -Wa bo, ez nê vatenanê to Ella'y rî vano. Ella'y zî ci cewab da, ez to rî ana.

Ü xatir wazeno, çiman ver a beno vinî, şîno.

Bahdê şîyayenda Cebraîl'i, hele tî yê senî kenê, senî

**ARMANCI
biwane,
bide
wendene,
abone
bibi,
abone
bivîne!**


Nuha
Axa biyaniyê te
vedişêre

Nuha
Gullêni di canê te de
nefretê vedireşe

Nuha
Kenê te maka
hêviyê ye

û emê te têxin
arşîva dîrokê.


Hewâlên wî ên
Partiya Pêşeng



Mistefa Tanguner

(1. 1. 1959- 4. 11. 1985)

X 2 C e p T I S



Amadekar:

S. Rêving

jan, kul. 2- a- Kulîlkekke meha Adarê b- Peyveke gazikirinê. 3- a- Pêşrew, serkêş 4- a- nereheti, nerawestiyana zarokan (berevajî) b- Bayê pir bi hêz 5- a- kesê ku masiyan digre b- kutiya "numara, number" 6- a- sê herfêñ elfeba kurdî b-hediye (berevajî) 7- a- şefeq, elind, berbang b- qezayeke Kurdistana İraqê (berevajî) 8- a- pronavek (berevajî) b- kesê ku hay ji tiştekî heye, kesê ku meselê dizane 9- a- du herfêñ bêdeng b- pronavekî işaretê c- rojekê heftiyê. 10- a- navê cihekî ji laşê mirov. b- perçequmaşek ku pê pencera, an deriyan digrin. c- pronavekî işarkî ji bo kes û tiştên mê (berevajî) 11- Libêñ genimî ên kelandî. b- Navê kinkirî ê şirketeke mezin a supermarketan li sê welatên îskandînavî. c- kes, an heywanê neji, ê ne sax, bê ruh. 12- Genim, ceh, an garisê hatiye durînê, b- bêhin.

Ceperast: 1- a- Serokê Cumhuriyeta Mahabad a Kurd. 2- a- reqemek (berevajî) b- peyveke pirsê c- pronavek (berevajî) d- kesê ji mirov re ne biyani, ê ku tê nasin. 3- a- Maç, mûç. b- Perçe paçık, pate ya ku mirov pê cihê qetiyayî ê cilan didurû. 4- a- gotineke şasbûnê xuya dike. b- Qezeyeke Kurdistana İraqê ku bi piranî Kurdên êzidî lê nûdin. 5- a- Dîn, ayîn. b- heywanekî kûvi (berevajî) 6- a- Sînonîmeke "ku" (berevajî) b- daçekek c- Koçer 7- a- Gep, perçekî biçük ê xwarinê an nanî. b- Eşirek e ku li perçen Kurdistana Tirkî, Kurdistana İraqê û Kurdistana İranê dijî. 8- a- Li Kurdistana Sûriyê ji qumasê ne baş, ji ê ne esli re tê gotin (berevajî) b- sira, rêt (berevajî) 9- Li devera Behdînan û Hekari darika ku pê listika "Koşoyanê" dilîzin, (Kaşoyanê

listikeke wek "Golf" a ku li Ewrûpa û li cihê din tê listin.) b- Feodal. c- pronavek 10- a- Pro-navekî kesîn. b- Li devera Behdînan ji "listik", yan "henek" ê re têt gotin. c- daekek (berevajî) 11- Dilketiya Memoyê Alan (berevajî) b- Karikê nêr ê hatiye bizina. 12- a- Berdestê hosta, yan xwendekar. b- Tiştên ji zîv hatine çekirin.

Serejêr: 1- a- Poz- bilind b- cûrekî nîvisê c-

Bersîva Hejmara 109'an

Ceperast: 1-a) Jîyan. b) asteng. 2-a) adarok. b) iro. 3-a) ned. b) virnî. c) ev. 4-a) zîz. b) aduc. 5-a) veniştin. 6-a) eger. b) Op. 7-a) yar. b) avî. 8-a) ahûbrip. 9-a) adnap. b) ifes. 10-a) nadres. b) orîj. 11-a) leylan. 12-a) na. b) dê c) nî

Serejêr: 1-a) Jan. b) meyxane. 2-a) idek. b) ga. c) da. 3-a) yad. b) verandin. 4-a) ar. b) zer. c) har. 5-a) Novîn. b) rûpel. 6-a) kizir. b) sed. 7-a) erk. b) yê. 8-a) senato. b) ol. 9-a) idip. b) Pîran. 10-a) eî. b) un. c) finî. 11-a) nec. b) avrêj. 12-a) gov. b) sê.

Hukûmet qatîlên faşîst xelat dike

Layîha-pêşniyara-guherandina Qanûna Cezê ya Tirk bi daxwaza gelek guherandinan pêşkêsi Parlamento ya Tirkîyê bû. Di layihê de idama di cezayê� narkotik de tê rakirin û mîqtara cezayê� ku tatbiqî teroristên rast dibin jî di maddaya QCT'ê de tê daxsistin.

Layîha-pêşniyara, tasarı-ku wê di Komsiyona Edaletê ya Mezîn û di Heyeta Giştî de li ser bê rawestandin, berî bi çendekî di Heyeta Wezîran de hatîb qebûlkirin. Li gor ku rojnameyê Tirkîyê dinivîsin, di vê layihê de bi kurtayî wê di maddeya 313'an de a QCT de guherandinê jêrîn bêr kirin:

Bi taybetî ev madde tatbiqî hêzên rast dibe û xasseten ji gelek militanê partiya MHP-partiye faşîst bû, pişti darba 12'ê ilonê ew jî hat girtin, nuha bi navê MÇP xebata xwe ya siyasi didomîne-ku ji vê maddeyê hatin cezakirin, wê ji nuha pê ve ne ji ber ku wan rîxistin ava kirine û bûne endamên wê, bes ji ber súcen ên ku wan di nav rîxistinê de kirine bêr ceza kirin. Cezayê heta bi pênc salan ji ber ku wan rîxistin ava kiribûn ku ji wan re hatîb dayin, wê bête rakirin.

Lê li alî din cezayê� maddeyê 141-142'an ji hêzên pêşverû û şoresger re tê dayin, her wek xwe dimin. Yanî, gava yên paşverû û faşîst rîxistina ilegal ava bikin, bibin endamê wê, ne súc e, cezayê wê tuneye, lê gava kesen çep, pêşverû û bikin, wê gavê him súc e û him ji cezayê wê heye. Bi vê guherandinê ew çend qatîlên faşîst ên ku nuha di hundir de ne bi vê guherandinê wê bêr berdan.

Konferansa Ewlekarî û Hevkarî...

derheqê wî de dawe hat vekirin. Heta wexta wî di dawetê de stran digot Wezîre Karûbarê Hundir yê Tirkîyê Abdulkadir Aksu ji govend li ber digirt.

Heta azadiya ibadeitê ji li Kurdistanê tuneye. Melê welatparêz di camiyê de tê kuştin. Kurd nikarin huwyeta xwe ifade û eşkere bikin. Li dijî gelê Kurd şerekî ne îlankirî dom dike. Gund tên valakirin, goristan tên şewitandin. Bes na tenê mefê mirovayî, mafê jiyanê ji li Kurdistanê nemaye. Di rastiyê de dewleta Tirk peyman û normen huquqî yên navne-

tewî îhlal dike û ji ber van îhlalan ji dewletên endamên KEHE ji Tirkîyê tu hesabî napirsin. Kanî ewlekarî, aşti, mafê mirovî, demokrasî, mafê eqaliyetan? Ku van prensibên esasi yên KEHE ne.

Li hêla din li Parisê bi munaseba Konferansê hêzên Kurd û Tirk (alîgirêن Pêşeng, alîgirên KUK-SE, Hêviya Welat, Komkar, Têkoşina Sosyalist û Bîrlîk Yolu) di 20'ê Çiriya Paşin de bi meşkê Ozal protesto kirin û belavokek belav kirin. Di belavokê de tê gotin ku: "Beşadarbûna Ozal ya Konferansê bi navê

însaniyetê û demokrasiyê eybek mezin e û beşdarbûna wî ya Konferansê ne li gora prensibên KEHE ji ji."

Prensib û peymanê KEHE li hemû dewletên ku endamên wê ne derbas dîbin tenê li herêma Rojhilatê (Kurdistanê) Tirkîyê derbas nabe. "Ma gelo KEHE ji li dijî Kurdan e?". KEHE ji gelên Ewrûpî re kîfxewesi, ewlekarî û aramîyê dixwazin. Lê çima vê yekê ji bo gelên din yên cihanê û ji Kurdan re naxwazin? Ma bêyî Ewrûpiyan gelên din ne layiqî ewlekarî û aramîyê ne? •

"İstîxbarata Alman...

civînên me, ya beyanên ku me li Kopengangê di cîvîna KEHE de dan wek sansura li Tirkîyê heye, li vir ji ji ber sansura fişî di masmedîa de cî negirtin. Li bajarê Kielê firmeyek bi navê MAK ji Tirkîyê re tankên Leopard modernize dike. Ez li ber vê firmayê

hin faaliyetên herêmî difikirim.

Nuxta dawî ji dixwazim li ser qanûna biyaniyan bisekinim. Guherandinê hin maddeyê Qanûna Esası, mafê iltîcayê gelek dijwartir kir. Ev yek ji bi taybetî tesîrê li Kurdên Tirkîyê û yên Iraqê dike. Bi

alîkariya rîxistinê Wîlâyet û yên qezan ên Keskan emê munaqaşa li ser Tirkîyê bibin parlamentoye eyalet û hewl bidin ku ew kesen iltîca wan qebûl nebûne teslimî Tirkîyê nekin.

Avabûna "Azadî" yê

tomarek gili û gazinên wek hev ên Kurdan hê ji Çiriya Paşin a 1921'ê de hebûn. Ya hefta iddia dike ku Tirk di wê fikrê de ne ku ger Kurd karibin wê heyetekê bişînin Ewrûpê, wek ya yazdan ku min liste kiriye. Binêre FO 371/6369 n. 464, Çiriya Paşin 1921, Fermandarê Leşkerî yê Hêzên İtilafê GOC Constantinople, ji bo War Office(Wezerata Şer) 6- Air 23/411 8'ê Çiriya Paşin 1924. Ev hesap şâşî û zeîfrêxistiniyek din a Azadiye ye û bi taybetî ji di Iraqê de. Hinek têgîhiştin di mewqufê Seyîd Taha de hebû. Di Hezîrana 1925'an de, SSO ya, Erbilê, W. Foote, rapor dike ku xwestiye keşif bike ka çi têkiliyê Seyîd Taha bi İhsan Nûrî, Tewfik(Tevfik) Cemîl, yan ji Ahmet Rassîm re hene. Tê xwiyakirin Seyîd Taha ne bêdil bûye ku bi awakî bêqîmet cihêtir e. Xwiya ye,

Ji Foote re got; fikra wî ew e ku hersê meriv ji welatparêzin heqîqi ne û qîmetdanek wî ya bilind heye li ser hişyarî û bikêrhatiya (jêhatitiya) İhsan Nûrî. Taha bêhayiya xwe ya li ser karûbarê wan ên nû yan ji têkiliyê wan bi "rêxistinê Kurd" re da diyarkirin. Got ku her sê qaçaxên eskeriyê "gelek tiştinê kêm jê re gotine" Seyîd Taha bi wê yekê re hemfikir bû ku wan li Rewanduz bîcivînin wî ciyê ku ew dixwazin lê bin û got ku yan na emrên pêştir divê ji bakûr bêr" Binêre Air 23/436 "lêkolîna Bayt-Ash-Shabab" 15'ê Hezîrana 1925'an. 7- Air 23/436, 7'ê Sibata 1925'an. Ev rapor ji Qerargeha Bexdadê ji alî zabîtê(yuzbasî-kapitanê) 550'yê hatiye nîvisin. Ne xwiya ye ka di agahdariyê wî de çavkanîtiya İhsan Nûrî heye yan na. ..

Hevaleka Jiyane

Erê, rewşa me Kurdan, kêm zêde em û dinya tev pê dizanin. Ji zilm û zora dijmin bigre heta belavbûna me li dinyayê û problemen xeribiyê.

Em Kurdên penahende ku dûrî zilm û zora li gelê me dibe dijîn ji, ne bê problem in. Dibe ku ji aliye aborî ve hinekî pişta me qewîn be, lê ew jî ne her tim. Gelek caran bi nanezikê diqedînin û nan û dewê Kurdistanê bi bîra wan tê, bi wê ferqê ku nanezika xeribiyê geleki talter e! Wek em dizanin xweşî ne tim bi mal û pere ye.

Gelo derd û problemen me çine?

Gelek problem hene, mirov nikare teva binivise, lê hinek ji wan probleman geleki dariçav in. Bawer im ku em dikarin bibêjin ku piraniya Kurdên li derveyî welêt, herrek bi aveyê xwe nexweş e; ci patolojik ci ji psikolojik. Ew jî ji van probleman tê.

Berî her tiştî tiştî ku li Kurdistanê bi serê wan de hatiye, bêriya welêt, dost û hevalan, problema zimanê biyanî ku nahêle baş tevlî civaka têde ne bibin, dijîtiya gelên welatê lê, bê identitêt û hwd. Gelek Kurdên welatparêz xwe ji xem û kul û qehra winda kirine, jiyana xwe di nexweşanê nexweşiyê psikolojik de derbas dikan, an jî bi heb û dermanan kulên xwe derman dikan û jiyana xwe berdewam dikan. Nexweşiyek din patolojik e ku di nav Kurdan de xwiya dike, nexweşiya midê ye-zikê wan qul dibe! Ma gelo pîr ji xwarinê ye, an ji xweşiyê ye?

Problemek din jî ku vê dawiyê pîr xwiya ye problema keç û xorîn me ya zewacê ye. Belki hinek bibêjin ma ev çiye? - her roj bi sedan Kurd têne kuştîn jî nêza dimrin û di zindanan de winda dibin-tu ji me re dibêji. Belki ez şas bim, belki ne dema vê pirsê be, di nav me Kurdan de tabû be, şerm û guneh be, belki hê em ne gîhabin ji bo vê problema ku di nav me de heye. Lî dîsa jî ger çiqa hindik jî bin xwedîyê vê problemê, gerek bête xwiyakirin û em pê bizanibin. Ji ber ku ew jî Kurd in, ew jî insan in, mafê wan jî ê jiyane heye.

Wek xwiyaye piraniya Kurdên me yê li derveyî welat nikarin vegerin welêt û gelek ji wan jî ciwan û bêkar in. Ewê jî rojekê bixwazin bizewicin û bibin xwedî mal û zarok. Gelo wê çawa be? Hinek jê, dûr û dirêj li vê problemê nameyizînin. Nabêjin, çawa û çilo? Yeka(i) xerib tînin û dizewicin(ez bi xwe ne li dijî vê yekê me) û paşê bi hevre nabin serî-jî hev fahm nakin- zarokên wan bê ziman, winda dibin. Ji hev cihê dibin.

Wek hatiye gotin "hêşîrên poşmanan nayê", ê baş tê bifikire ji şâşiyê hevalen xwe û dora xwe fêr dibe û nakeve van şâşiyê hevalen xwe û ji dora xwe fêr dibe û nakeve van şâşiyen, an jî dixwaze bi keçekê/lawekî Kurd re bizewice. Problema me a din jî virde ye ewê çawa be?

Baş an xerab ji vê yekê re jî rê hatine dîtin. Hinek li welêt yan jî li welatekî din, hevalek xwe ya jiyane dibîn-lê herkes nikare vê bike. Hinek jî bi riya POSTÊ dizewice(ev jî gelek caran ji mecbûrî dibe, ji ber ku bi xwe nikare here) Nasekê(i) pismam, keçabavek/kurebavek nas tînin. Sûretekî xwe yê xweşik ji hevre dişînin û roja din wek tûrî nîska bi postê tê! Bi vî awayî bibê nebe pişî zewacê problem çedîbin. Ji ber hevûdû nas nakin, hevûdû nedîtine.

Ê mayî, yê bê welat, bê dîsko û yên ku Misilmantiyê an adetan azadiya wan a em bêjin seksolojik ji wan stendîye û hêviya wan yeka(i) Kurd e di mal de ji tunebûnê û xeribiyê re dimînin.

Problema zewacê ne tenê di nav gelê Kurd de heye, di nav hemû cihanê de jî heye. Li hinek welatan buroyen zewacê hene, bi wasita rojneme û kovaran, bi programen radiyo û televizyonan keç û xort hev nasdikin. Van kesena di welatek serbixwe de, di welatê xwe de dikan. Lî îcar em Kurd, ku miletê me kirine çar perce û li dinê tevî belav bûne, emê vê problemê çawa hel bikin, ci ji me tê?

Em jî xwedî mafê jiyaneke xweş in. Em jî xwedî nas û heval in, keç û xorîn Kurd ên gelparêz û dilovan pir in. Divê keç-xorîn Kurd, jin û mirê Kurd hevûdû nas bikin û dilovaniya xwe bi hevdû bidin xwiyanî kiran.

Di vî warî de ez ji berpirsiyaren rojname û kovarên Kurdî daxwaz dikim ku nîpelekî yan jî quncikekî bidin keç û xorîn ku li hevalekê(i) jiyane digerin, ku karibin bi vî awayî nêzîkî hev bibin, hev nas bikin û hevdû bibînin ji bo jiyaneke xweşit.

Cehwer Battê

Fîşa abonetiya Armancê

Salek

Abonetiya salekê
Li Skandinavya 120
Skr.

Tarîx:

Nav û paşnav:

Navnîşan:

Welat:

Postgiro: 50 37 99-9 Sweden

Heqê abonetiya xwe li ser postgiroya jorê bişînin.
Fotokopiya kvîtoya heqê abonetiyê û fîşa jorîn dagirin
li ser adresa jérîn ji me re bişînin.

Ferhenga Literatûri

Amadekar Bavê Naze

Çîrok

Çîrok(çiroka dirêj), rengek ji rengê éposê yê orte e. Ew ji romanê piçuktir e, li ji çivanokê(novellê) mezintir e. Helbet mezinbûn û piçükbiuna berhemê nabin reweştin bin-gehîn ji bo rengê éposê, lê heya derecakê dikare bibin sedemên cudakirina wan ji hev.

Wek nimûne roman bi saya hecmekî mezin û rûpelên pîr dikare qonaxeke mezin di dîroka miletan û jiyana kesan de bi giştî bide ber xwe. Her wiha jî di çerçewa vî hecmê mezin de dikarin çend sujet(xêzên pêşketina bûyeran) bi awakî peralel bêne ajotin. Lîbelê çîrok dikare di çerçewa xwe de xêzek bingehîn ji bûyeran qebûl bike û ne bêtir.

Ji xisletên çirokê yên din ve ew in; ku bi tonê çirokgotinê dest pê dibe û hêdî-hêdî bêyî ku nivîskar lezê bide lehen-gên xwe, rî ji wan re vedike û perçak ji jiyana wan(piranî bi awakî xironîk) pêşkêşî xwen-devanen dike.

Di edeba Ewrûpi de terminen çirokê berevajîya terminê romanê, ne bi yek navî bi kar tê. Wek nimûne, bi Rûsi jê re dibêjin "Povest", bi Almani; "Erzahleng" û bi Ingilîzî navê "Story" lê dikan.

Çivanok(Kurteçîrok)
emberî wê bi ïtalî novella ye.
Ev rengê éposê yê herî piçûk

e. Ew bi forma çirokgotinê, ji mêt ve hebû. Lî bi mana xwe ya heye, di serdema Vejandinê çêbûbû. Çivanok di sedsalê 14 û 15'an de di edeba ïtalî de, di berhemên Bokaço, Saketi û Mazûço de peyde dibe. sujet(mijar) piraniya çivanokê wan nivîskaran ji folklor û edeba berî wan hatibû stendin. Lî belê ew bi form û naveroka xwe ji yên berî xwe cuda dibû.

Weku nas e, di serdema Vejandinê de, şexsiya ferd bi romanen aza û pêwendiyen serbixwe, ber bi çêbûnê ve diçû. Lî di hoyen civaka derebegiyê de, merov wek parçak ji komek xelkê dihata hejmartin. Di mefhûmê heymê me de, ew bê şexsi û iradek serbixwe bû. Bi taybeti di qonaxa vejanandinê de, ïnsan wek kes aza dibe û li ser bingehê vê prosesa dîroki ya aloz, ev rengê nuh ji edebê çê dibe. Û cara yekem di çivanokê de, jiyana kesan ya bi taybeti, di lehengan de gewde dabin.

Helbet ev naveroka nuh ji bo edebê, formek nuh jê re divya bû. Û çivanok bi formê çirokgotinê, bû kiras ji naveroka nuh re. Heger cinsen edebî yên berê bi uslûbeke bilind dihate nivîsandin, êdî çivanok bi stîlek nawinde de tê nivîsandin. Bûyeren wê jî di jiyaneke rojane de derbas dabin û ji nîka ve xîlas dabin. Bi xwe

zimanê çivanokê rolek mezin ji sinorkirina çerçewa wê dilize. Gotinên wê wilo li ser hev tenê regefandin, heya dihêle ku di bin gotineke de gotinek hebe. Ji ber zimanê xwe yê li ser hev(kompakt), êdî çivanok di pêşketina xwe de, alozitir dibe. İca rî li ber çivanoka nefsi vedibe û di dawiya sedsala 19'an û destpêka sedsala 20'an de çivanok dighê ewcê xwe yê herî bilind.

Roja iro mefhûmê çivanokê, di zimanê miletên Ewrûpi de, ne wek hev in.

Bi Rûsi "Rasskaz" û "Novella" ne yekin. "Rasskaz" bi forma xwe ji "Novellê" mezintir e û bi çirokgotinê hêditir e. Bi Almani ji "Erzählung" û novella ne bi yek manê ye. Û bi Fransîzîemberî novellê-ricit, bi kar tê. Ereb di şûna novellê de "Qise qesine" bi kar tînin. Mana wê ya herî ev e :Kurteçîrok" Gelo ji bo zimanê Kurdî kîjan têrmîn li gor me ye. Di nîrîna min de çivanok ya herî baş e. Mane Kurd ji mêt ve, di folklor xwe de van gotinan bi kar tînin. "Çirokê, çivanokê". Mebest jê piçukkirina çirokê ye. Lî herçî çirok ew rengekî nawende ji cînsê edebî ye.

ne karê aqila ye lê rast e

Amadekar: Hesen Mizgîn

Şopa pliyê(lingê) Neil Armstronge ku cara yekemin çû hîvê wê heya 500.000 salan wînda nebe. Li hîvê ba tuneye.

Wek tê zanîn pênc(5) hîsên ïnsan hene û her yek ji organek xwe heye. Aliman di ïnsanen de hinek organen nuh tespît kirine. Berê wisa dihat zanîn ku ev organ tenê di pisik û meymûnan de hene. Ev organa ha bêtir hesas e û bi destlêdanek pîr sivik reaksiyona xwe nîşan dide û dest pê dike sinyalan dişine mijî. Rehîn ku van sinyalan dabin mejî yên hê teniktirin.

Niha II îskandinavyayê nêzî 1300 zarokên ku bi metoda lûle tén dinê hene û ji wan 400 zarok II Swêdê hatine dinê. Pêşylî tovav (sperma) jînê û ya mîr di lûlekê de tén

tamandin û pişt re II malzaroka (rehîm) jînê tê bi cîh kîrin, Bi vê metoda ha şansa hemleketin(bî zarokbûn) %20 e. Nêzî %20 ji ber diçin û ji yên mayî %15 cêwî tînin.

Bisiklêtek ku bi enerjiya rojê diçe hatiye çekirin û di seetekê de dikare 40 km. bi lez biçe.

Teyare di dema germiyê de bi rehetî nikarin billind bibin. Billindbûna teyeran di hewa sar de rehettir e

Li dinê ku karika herî bi emir 40 milyon salî ye û li Komara Domînîkayê hatiye dîtin.

Nuha Kanala Brîtanyayê ku wê Brîtanyayê û Ewrûpayê bigîhîne hevdû tê avakîrin û wê di demek néz de ji bo trafikê bête vekîrlîn. Makîneyen ku niha di bînê bahrê de ne û kanal dikolin, plîstî dawîlêhitina kanal wê bîn xurde kîrin û di bîn bahrê de bîn hiştin. Ji ber ku mesrefa transpora wan ji flyeta wan zêdetir e.